Rupel 1welatu++++++++++:Layout 1 15.09.2010 17:19 Page 1

# Xwediyên Xelatên Apê Mûsa aşkera bûn



1 Di beşa karîkaturan de karîkaturê Raîf Zor hêjayî xelatê hate dîtin. Endamên juriyê herî zêde di vê beşê de zehmetî kişandin.



1 Di beşa fotogarafê de fotografê bi ser navê “Banyo ve çadirda yaşam (banyo û jiyana di konan de)” Paşa Îmrek qezenc kir.

Xwediyên Xelatên Rojnamegeriya Kurdî û Şehîdên Çapemeniyê yên Mûsa Anter ku her sal wekî kevneşopiyê tê lidarxistin aşkera bûn

Di beşa tirkî de nûçegihana DÎHA’yê ya Wanê Nazan Sala bi nûçeya “Bûkên firotinê”, di beşa nûçeyên kurdî de jî nûçegihanê ANF’ê Serdar Eroglu bi nûçeya “Kevirê bi nalet yê Kêlaşînê!”, di beşa wêneyan de jî Paşa Îmrek, di beşa karîkatur jî Raîf Zor xelat girtin. Xelata Rûmetê ya Çapemeniya Azad ji bo Xwediyê Îmtiyazê û Berpirsê Karên Nivîsaran ê Rojnameya Azadiya Welat Ozan Kilinç hate dîtin. Xelat dê di 19’ê îlonê de bi merasîmekê li Amedê xelat bêne dayîn... *RÛPEL - 11*



Karîkaturê Mahmut Ulusan hêjayî xelata taybet a juriyê hate dîtin.

www.welat.com

# Rojeva Welat

16 Îlon 2010 Pencşem Buha: 50 Kr Hejmar: 9

E-mail: awelat2002@yahoo.com

# Kî şer dixwaze?

Ji dawîbûna biryara bêçalakîtiyê re 4 roj man. Di van rojên krîtîk de hevdîtina bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hate astengkirin. Di demeke wiha krîtîk de astengkirina hevdîtinê mirov difikirîne û pirsa gelo hikûmet şer dixwaze tîne bîrê

### DI ROJÊN KRÎTÎK DE ASTENGIYA HEVDÎTINÊ

Di rojên dawî yên herî krîtîk a biryara bêçalakîtiyê de hevdîtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a bi parêzeran re hate astengkirin. Parêzerên Ocalan ji bo hevdîtina asayî ya bi muwekîlê xwe re duh çûn Gemlîka Bursayê. Lê bi hinceta koster xerabe ye hevdîtin hate astengkirin. Di nêzîkbûna 20’ê îlonê de astengkirina vê hevdîtinê pirsa; ‘gelo Hikûmeta AKP’ê şer dixwaze?’ anî rojevê. KCK û KONGRA GEL li ser bangewaziya Ocalan di 13’ê tebaxê de biryara bêçalakîtiyê girtibû û qewlê bêçalakîtiyê di 20’ê îlonê de bi dawî dibe.



### ŞERTÊN BÊÇALAKÎTIYÊ PIŞTGUH DIKIN

Biryara bêçalakîtiyê li ser daxwaza Ocalan di 13’ê tebaxê de ji aliyê KCK û KONGRA GEL ve hate îlankirin. Di vê pêvajoyê de tevgera kurd li gorî bêçalakîtiyê tevgeriya lê dewleta tirk nesekinî. Di vê pêvajoyê de tu bersivên erênî yên ji bo şertên siyaseta kurd nehatine dayîn, zêdetirî 20 gerîlayan jî hatin qetilkirin. Siyaseta kurd, 4 şert danîbûn ber Hikûmeta AKP’ê: Rawestandina operasyonan, serbestberdana siyasetmedarên kurd, daxistina benda hilbijartinê û başkirina şert û mercên Ocalan û rê li ber vekirina ji bo muzakereyan... ***RÛPEL - 5***

# ‘Em ê her derê bikin dibistan’

Berdevka TZPKurdî Xecê Şen diyar ku bi kampanyaya hefteyekê boykotkirina dibistanan divê hikûmet gavên erênî biavêje, heke ji vê bangê re bersiv neyê dayîn dê her derê bikin dibistan

Berdevka TZPKurdî Xecê Şen, diyar kir ku xebatên boykotkirina dibistanan dê li hemû herêmê û Tirkiyeyê bêne berfirehkirin. Şen, anî ziman ku di çarçoveya xebatan de dê li hemû navçe û bajarên



TZPKurdî lê heye bi bername û plansazî çalakiyan li dar bixin. Xecê Şen da zanîn ku ev xebat ne tenê ya TZKurdî ye û divê hemû sazî û dezgehên kurdî piştgiriyê bidin vê xebatê û got ku ew ê daxwaz bikin ku perwerdehî bi temamî bi rêveberiyên herêmî ve bê girêdan... ***RÛPEL - 4***

## Egîtîm Sen: Perwerdehiya zimanê zikmakî şert e

Seroka Giştî ya Egîtîm Sen’ê Zubeyde Kiliç biryara TZPKurdî ya hefteyeke boykotkirina dibistanan nirxand û got perwerdehiya zimanê zikmakî şert e. Kiliç der barê biryara boykotkirina dibistanan ev tişt gotin: “Li ku dera cîhanê li kîjan welatî dibe perwerdekarek ji bo zarokekî perwerdehiya zimanê zikmakî diparêze. Em wekî perwerdekaran dibêjin bila hemû kes zimanê xwe zikmakî perwerde bibîne. Daxwaz jî li ser vê esasê ye.”... ***R.4***

**Boykotek çû ma yek....** Nivîsa Mîrza Ronî R.2



## Gel li rûmeta xwe xwedî derket

*Gelê kurd bi awayekî girseyî li şehîdên xwe xwedî derdikevin. Li Wan, Hezex û Cizîrê bi 10 hezaran kurdistaniyan darbestên gerîlayên di arefeya cejna Remezanê de li devera Bileh û Binefşan a Colemêrgê hatibûn qetilkirin li erdê nehiştin. Girseyan dirûşma ‘tolhildan’ berz kir...* ***RÛPEL - 3***

# GGC’ê xelat da Vedat Kurşun



Cemiyeta Rojnamegerên Başûrêrojhilat (GGC) ku her sal wekî kevneşopiyê pêşbaziyê “rojnamegerên serkeftî yên salê” diyar dikin, encamên wê aşkera bûn. Xelata Juriyê ji bo Xwediyê Îmtiyazê û Berpirsê Karên Nivîsaran ê Azadiya Welat Vedat Kurşun hate dayîn. Juriyê, di pêvajoya demokratîkbûnê de 166 sal û 6 meh cezayê ji bo îfadeya ramanê hatiye birîn di cih de nedît û ji bo piştgiriya hevpîşeyî Xelata Taybet a Juriyê da rojnameger Vedat Kurşun. Her wiha di beşên nûçe, hevpeyvîn, fotograf, sport, beşa nûçeyan a televîzyonê, beşa bernameyên televîzyon û radyoyê û mîzanpajê de kesên serkeftî jî aşkera kir. Kesên ku xelat girtine dê bi merasîmekê xelatên wan bê dayîn. Xelatên GGC’ê di 2’yê cotmehê de li Lokala Cemiyeta Rojnamegerên Başûrêrojhilat bi merasîmekê bêne dayîn.

## 38 de zî hintayê daristan nêveşnay

Dêrsimî di 1937 di waxta ke Qanûna Islahata Şarkî viraştîy de hintayê daristanî nêveşnaybîy. Nêy vatişî aidê şahidê qetlîyama Dêrsimî ra Yûsuf Guderî yo û vat ey rojî ra hetanê ewro zî berdewameya qetilkerdişî dom keno... *DIMILKÎ R.9*



## Aqilmendan dest bi hevdîtinan kir

Heyeta di bin rêbertiya Serokomarê Fînlandiyayê yê berê û xwediyê Xelata Aştiyê ya Nobelê Marttî Ahtîsaarî “Komîsyona Aqilmendan” Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr ziyaret kir. Baydemîr, diyar kir ku ji bo çareseriya pirgirêka kurd hemû rêbazên ewlehiyê hatin bikaranîn û çareserî diyalog û muzekere ye... *R.5*

www.arsivakurdi.org

# Boykotek çû ma yek

## Dive kurd pergala ku kurd-kurdî têde neyî boykot bikin û hebûna xwe di makezagona de cih bike. Ji pêngava îro pêde heta kurdî fermî nebe xebatên xwe qet ranewestîne

**MÎRZA RONÎ**

Ji maratona referandûmê 'kurd' serfirazî derketin û encama boykotê, ala 'xweseriya demokratîk' bilind kir. Bajarên kurdewar, wek Amed, Şirnex û Colemergê sindoqen vala ji Enqere re şandin û bersivek kurdî dan A-K-P'ê. Ji îro û şûnde divê desthilatdariya Enqereyê baş bizanibê ku kurd, êdî rêveberiya xwe dixwazin û desthilatdariya Enqereyê naxwazin. Rewşa ji hilbijartina referandûmê derketî, li qada siyaseta Tirkiyeyê de du hêz diyar kirin yek hêza 'boykotê' yek jî hêza 'erê' bû. Hêza boykotê ji tevgera gelê kurd re hêza azadiya heremên kurdan bû. A erê jî ji A-K-P'ê re erêkirina hêza îslama siyasî bû. Ji îro û şûnde tevgera gelê kurd wê mafekî erênî daxwaza xweseriya demokratîk li Kurdistanê de pêk bîne. Ji hêla A-K-P'ê ve jî wê hêza xwe ya îslama siyasî nava Tirkiyeyê de tiştê ku bikarê wê pêk bîne.

Ji hêla me kurden ve, dive tişta ku me destxistî, em ne berdin û daxwaza gelê kurd a xweseriya demokratîk pêk bînin. Ji vê encamê A-K-P jî êdî dizanê ku gelê kurd çi dixwazê. Ji wê çendê hêza kurd a tevgerî, rêxistina xweseriya demokratîk dive berî her tiştî bigire dest û pergala xwe ava bike.

Dîsa di vê encama boykotê de ya ku min gelek keyfxweş dike encama kurdewar e. Îradeya neçûna ser sindoqa îradeya parastina nasname û hebûna kurdewariye. Di nava kurdewariyê de hêza mezin jî, hêza ziman e. Îro ji bo diyarkirina hebûna kurdewar ziman erka sereke ye.

Wek ku tê zanîn bîstê vê mehê dibistanên tirkî vedibin û bi hezaran zarokên kurd wê nû biçin dibistanên tirkî. Zarokên qet tirkî nizanin wê her sibehê di sêrî de sonda neteweperestî bixwînin û dest bi perwerdeya tirkî bikin. Di wê sonda netewperestî de; hin hevok rasterast êrîşî hebûna mirovan dike. Ango di hevoka di bêjin; "türküm-tirkim" an jî dîsa tê gotin: "varlığım türk varlığına armağan olsun-hebûna min diyarî hebûna tirkan be." Bi van hevokên neteweperestî, di sêrî de bi mejiyê zarokên kurd tê lashîstin û derûniya zarokên heft salî xira dikin. Berî her tiştî divê kurd ji îro û şûnde di hişyariya zimanê xwe de bin û pergala neteweperestî a zimanê kurdî qebûl nakê "boykot" bikin. Di vê pergala perwerdeya tirkî de, zimanê kurdî qedexe ye bibê zimanê perwerdeyê.

Ji îro û şûnde, dive kurd pergala ku kurd-kurdî têde neyî boykot bikin û hebûna xwe di makezagona de cih bike. Ji pêngava îro pêde, divê gelê kurd û tevgera gelê kurd ji zimanê xwe re hişmend tevbigere û heta zimanê kurdî nebê zimanê perwerdeya fermî raneweste. Di destpêka vekirina dibistanên tirkî de divê dengekî bilind dibistan bên boykotkirin û gelê kurd daxwaza perwerdeya zimanê xwe û azadiya zimanê xwe bixwaze. Çawa ku me di referandûmê de got boykot; dive em ji pergala ku zimanê kurdê tê de ne fermî be, em bibêjin boykot. Em çiqas daxwaza fermîbûna zimanê xwe bikin ew qas zimanê me wê azad bibe. Heke gelê me wek sindoqa, dibistan jî vala hiştin wî demê boykota dibistana jî wê ser bikeve. Di vir de erk dikeve ser milê hemû mirovê kurd ku zarokên xwe wê hefteyê ku dibistan vedibin de, ne rêkin dibistanê û bi daxwaznameya wezareta perwerdeyê dagirî bikin. Bila ji îro şûnde dirûşmên me: "ji pişaftinê re boykot, ji yek zimanî re boykot, ji dibistanên yek zimanê re boykot, ji qirkirina çandî re boykot û em perwerdeya zimanê xwe dixwazin." Qîrînên me bin.

Wek boykota çûyî divê em vê boykota bîstê mehê dest pê bikê jî, bi dengekî bilind boykot bikin. Û bibêjin: "Bê ziman jiyan nabe, bê perwerde ziman jî nebe"

# *Alayên Hemîdî û Alayên Erdogan*

**FÊRGÎN MELÎK AYKOÇ**

Di dîroka kurdan de birîna herî kûr dûviktî, caşitî û milîstiya dijmin kirine. Ji roja ku tirkan bi alîkariya kurdan li Melezgirtê leşkerê Romayê şikandin vir ve, têkiliyê me û tirkan li ser bingehekî ne wekhev dimeşe. Tirkan tim wek maşeyek bikaranînê û xapandinê li kurdan nêrîne. Tenê çend mînak dikanin vê rastiyê li ber çavan raxîne.

Yavuz Sultan Selîm di şerê Çaldiranê de bi deh hezaran kurdên elevî û êzîdî qetil kir. Gava ew ji wir vegeriya jî, li aliyekî bi şex Îdrisî Betlisî re peyman çêkir, li aliyê din li ser kaniya li Mûşê jî wiha da nivisandin: "Bila ev av bibe nesîbê kafiran, nebe nesîbê kurdan.. Divê ço ji ser serê kurdan ranebe!.."

Hema bigire hemû sultan û serdarên tirkan bi wî awayî nêzîkî kurdan bûne. Wek mînak ji bo ku bikanin serhildana Bedirxaniyan bişikênin, bi Yêzdan Şêr re dikevin têkiliyê, li pey şikandina tevgera Bedirxaniyan, vê carê jî berê xwe didin Yêzdan Şêr. Ango bi sextekarî xapandin, parçekirin û têkbirin.Padişahê dawî Abdulhemîd hem dîn bikaranî, hem jî êrîşên di dema Çarên Rus de bi alîkariya hin çeteyên ermenî li Kurdistanê pêkhatin kir mijara bangaşiyê û li ser wî bingehî komeke mîlîsên bi navê "Alayên Hamîdiye" da damezirandin, bi ranteke sivik ev cerdevanên wê demê di kujeriya ermenî û suryaniyan de hem jî tenî ji bo karên herî bi qirêj yên kujêriyê bikaranîn, ku niha jî dixebitin, kujêriyê têxin stûyê wan.Di serhildanên li Kurdistanê yên destpêka salên bîstan de jî ji bo şikandina serhildanan û parçekirina gelê kurd li hin bajarên wek Elezîz û Amedê bi destên hin mîlîsên diz dikanên esnafên bajêr dan talankirin û xistin stûyê serhildêran. Bi wî awayî têkiliya gelên bajêr û serhildêran dan qutkirin. Hîna jî ew şêlandin ji bo reşkirina serhildanan wek bangaşiyeke qirêj tê bikaranîn.

Her çendî helwesta Turgut Ozal ya li hemberê tevgera kurd wek erênî tê zanîn jî, dewletê di dema wî de ev mijara cerdewaniyê li ser bingehê Alayên Hemîdî kir bela serê gelê me. Ango li rûyê me dinêrin dikenin, lê xencerê di bin çengê me re dikin.R. Tayip Erdogan ji kevneşopiya "akinciyan" tê. Akinciyan tim Abdulhemîd ji xwe re wek rêber dîtine û Itihat Terakî jî bi îxanetê tawanbar kirine. Çend roj berê di mîtînga li Stenbolê de AKP'iyan weneyê Erdogan wek siwariyekî di nava lîbasê padişahên osmanî de çêkiribûn. Ev wêne tenê bi serê xwe nîşan dide ku ew xwe wek osmaniyên modern dibînin. Bi gotineke kurt û kurmancî ew li pey împaratotriyeke nû ne.

Ew Tevgera Azadî li pêş vê armanca xwe wek kelemekê herî dijwar dibînin, pêşeroja xwe jî di têkbirina Tevgera Azadî de dibînin. Ji bo şikandina hêza Tevgera Azadî serî li her metodî didin. Bi hezaran siyasetmedarên Tevgera Azadî ya di qada siyasî de girtin, li pey hev tezkereyên şer derxistin, di warê dîplomasiyê de li ser her bendî lîstin, lê nebû. Bê alîkariya hin dewletên ji bo berjewendiyên xwe bavê xwe jî difiroşin, tu serkeftin bi dest nexistin.Niha jî li pey "Alayên Hemîdî" yên modern ango xwende ne. Berê ji bo vê armancê, kesên nav Mîr Dengîr, Kurt û nizanim çi quzilqurtan şandin nav hin qaşo kurdên li kuçeyên Ewropayê qelem li ba dikirin, ji başûr bi şantaj, gefxwarinan û xugî teklîfkirinan alîkarî xwestin. Di encamê de têgihiştin ku bê formeke Alayên Hemîdî birêxistinê, riyeke din li pêş wan nemaye. Ji bo vê berê afirê rantê TRT 6 dan vekirin. Mirovên rizî li wir civandin.

Niha jî bi şîara em ê li pey referandûmê muhalefeta Tevgera Azadî biafirînin bêşerman derxistine kuçeyên Amedê wekî çengiyan ji bo yek dengeke "erê" didin reqisandin. Van derdoran di salên heftêyî de jî ji bo "Karaoglan Ecevît" li diji akinciyan heman dûviktî kiribûn, lê Ecevît ji wan re demokrasî neanîbû. Wê akinciyên duh dijmin, îro dostê wan jî tu tiştekî nede wan.Ev derdorên li ser bendê Erdogan rabûne govenda Alayên Erdoganî li Ewropayê jî di bin navê kurdên diasporayê de dixebitin ku miroven teşwîkê vê tawana qirêj bikin. Lê ji bo yekitiya kurdan, pêşeroja kurdan gavekê biçûk bi pêş ve avêtinê cih bihêle, bi êriş û çamûr avêtinan rê û rêçikan jî dilewitînin.Erdogan li pey împaratoriya xwe avakirinê ye. Ji bo vê her sextekarî, dek û dolaban ji xwe re wek mafeke xwezayî dibîne, lewma li nava çavên mirovan dinêre û derewan dike. Lê hin mirovên xwedîgiravî nijadkurd, qaşo ji xwe re rewşenbîr dibêjin jî, bê ku mînakên berê yên dîrokî wek mijara Xumeynî û serkariya wan ya îro bibînin, dibin qirêjiyên bin lingên Erdogan. Lê wê dîrok wan şermezar bike! Wê rûreşiya wan di demeke kurt de bibe têkçûna wan.

## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Di dereke robarê de di saniyeyê de hecma herikîna avê **2.** Ji zimanê xwecihên Malezyayê **3.** Hejmarek **4.** Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Ji wî/ji wê... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê **5.** Eyd... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye? **6.** Rojek... Dewara nêr **7.** Rêxistina polîsan a naziyan... Gotinên ne li rê, ku ne li derveyî terbiyeyê ne **8.** Bi rûsî erê... Cihê ku xwarina heywanan tê de tê danîn **9.** Bajarekî Tirkiyeyê... Kurteya ajansa nûçeyan a Firatê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Tûj... Kurteya elementa Aktînyûmê... Beşeke malê, jûr **2.** Orjînal... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **3.** Nexweşiyek... Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin **4.** Yekeya giraniyê ku li Fransayê 30,59 gr û li Îngilistanê jî 28,349 gr û li Holandayê jî 100 gr ye... Mehek **5.** Hişaloz, bêhişê ku wekî sermestan tevdigere... Kurtebêja Ksenonê **6.** Hejmarek... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Li hin herêman di wateya 'tu' de tê bikaranîn **7.** Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Di heyna berê ya yewnanan de devera ku gelê Sîteyê ji bo ku li ser siyaset, rêveberî û bazirganiyê mijûl bibin, lê diciviyan **8.** Tevgera hewayê... Agir **9.** Beşer, mirov... Madeya ku tenê ji hêmanekê hatiye pê

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Z | A | Z | A | K | Î | ■ | D | E |
| 2 | ■ | R | A | ■ | A | R | G | Û | N |
| 3 | L | ■ | L | I | ■ | O | ■ | R | E |
| 4 | A | C | ■ | L | A | ■ | A | B | ■ |
| 5 | M | ■ | L | A | V | A | ■ | Î | D |
| 6 | A | K | A | M | ■ | M | Î | ■ | U |
| 7 | ■ | E | M | ■ | H | E | S | Û | D |
| 8 | A | Y | ■ | N | O | T | A | ■ | I |
| 9 | Ş | A | N | O | ■ | A | L | A | L |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 2 | | | | | | | | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | ■ | | ■ | |
| 4 | | | | ■ | | | | | |
| 5 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 6 | ■ | | ■ | | | ■ | | | ■ |
| 7 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 8 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 9 | | | | | | ■ | | | |

## Deng

# Boykotê zemîna muzakereyan xurt kir

**TAYÎP TEMEL** taylptemel@walla.com

Ne li gorî dilê kurdan be jî encamên referandûmê ji Tevgera Siyasî ya Kurd serkeftineke girîng bû. Bê guman heke xebateke sîstematîktir hatibûya meşandin û hişmendiyeke zelaltir esas hatiba girtin dê li gelek bajarên Kurdistanê encamên gelek baştir bihatana girtin.

Ligel vê yekê jî dîsa hemû şîrove û nirxandinên li Tirkiyeyê li ser esasekê têne kirin û nirxandina bingehîn wiha ye; "Jixwe diyar bû ku dê baskê 'erê' bi ser bikeve. Lewre aliyê mohra xwe li referandûmê da 'Boykot' bû.

Bi rastî jî di dema kampanyaya referandûmê de navenda propaganda û danasînê ji aliyê dewletê ve jî û ji aliyê kurdan ve jî Amed bû.

Bêguman gelek tişt dikarin li ser encamên li bajarên Kurdistanê derketine holê bê gotin. Lê tiştekî pir aşkera heye ku encama herî baş a boykotê ku bêyî şikestin û birîn, Colemêrg, Şirnex û li gorî potensiyale xwe ya ne homojen jî bajarê Wanê bû. Jixwe ev demeke dirêj e ku pêşengiya serhildan û berxwedêr ji aliyê van bajaran ve tê kirin. Lewre jî ligel encamên baş jî divê BDP û rayedarên wê bi awayekî cidî li ser bajarên wekî; Amed, Êlih, Bedlîs, Mûş, Agirî û navçeyên Mêrdînê bisekinin. Heta ya girîngtir ew e ku bi taybet li ser Bîngol û Dêrsîmê bê rawestîn.

Li gel kêmasî û qelsiyan jî encamên ku referandûmê derxistine holê gelek zelal in.

Ya ewil ew e ku bi derketine 'erê' êdî cih ji hincetên Hikûmeta AKP'ê yên wekî; 'Em dixwazin guhertinan pêk bînin lê em tên astengkirin' nemaye. Hem HYSK li gorî dilê xwe sererast kir. Hem jî têkiliya Dadgeha Bingehîn û siyasetê li gorî xwe çêkir. Dîsa bi van guhertinan pêşî lê girt ku leşker li hemberî wê bikevin nava hewldaneke darbeyê. Jixwe ev demeke dirêj bû di nava saziyên dewletê de û di noqteyên krîtîk de kadrobûyîna xwe bi lezginî didomand.

Wekî din cara ewil e ku bêçalakîtiya PKK'ê ev qas bi awayekî meşrû tê nîqaşkirin ku di encama hevdîtinên bi Ocalan re pêk hatiye. Piştî referandûmê minaqeşeya li ser çareseriya pirsgirêka kurd di raya giştî de zêde bû.

Di serî de yên wekî Cuneyt Ursever, Hasan Cemal û gelekên din xwestin ku derhal bi Ocalan re hevdîtin pêk bên. Rojnameya Akşamê bi berfirehî cih da bersivên ku Ocalan ji pirsên wan re dayîn.

Bêguman ev nîqaş hemû encamên 'boykotê' ne. Heke boykot ev qas mezin nebûya dê ev nîqaş nehatibana kirin.

Lewre kurdan bêyî ku bêjin 'na' destûr da ku AKP guhertinên li gorî xwe bi dengên 'erê' derxîne û ji hincetên xwe yên ne samî xilas bibe.

Hem jî bi helwesta xwe ya 'boykotê' dîsa mesajek da dewletê ku ev pirsgirêka kurd a mezin li benda çareseriya lezgîn e.

Yek ji encameke din a girîng ku boykotê derxistiye holê jî daxwaza 'Xweseriya Demokratîk' e. Niha şert û mercên ku kurd pergala xweseriya demokratîk daxwaz bikin, zêdetir amade bûne.

Êdî zelal bû ku Xweseriya Demokratîk, pêkhatina mafên demokratîk ên neteweya kurd e û ev yek bi demokratîkbûna Tirkiyeyê ve rasterast girêdayî ye. Lê heke Tirkiye xwe demokratîk neke jî kurd dê wekî çand, nasnameyeke cuda li Tirkiyeyê bikaribin xweseriya xwe îlan bikin. Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd, lazim e nasnameya kurd ji aliyê makeqanûnê ve bê qebûlkirin, astengiyên li pêşiya perwerdehiya bi kurdî bên rakirin. Her wiha divê meclîsên heremî yên kurd daxwaza wan dikin jî bên qebûlkirin. Lewra ev meclîs dê bi vîna gelê kurd pêk bên. Di van meclîsan de kurd dê pirsgirêkên xwe, bi xwe çareser bikin. Hin daxwazên xwe jî bi riya van meclîsan, dê ji hikûmeta navendî re ragihînin.

# Hikûmet şer dixwaze?

Bi nêzîkbûna 20'ê îlonê re di rojên herî krîtek de hevdîtina Ocalan a bi parêzeran re hate astengkirin. Di demeke wiha krîtîk de astengkirina hevdîtinê di nav civakê de gelo hikûmet şer dixwaze derxist pêş

**AMED** - Di rojên herî krîtîk de hevdîtina Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a bi parêzeran re hate astengkirin. Parêzerên Ocalan ji bo hevdîtina asayî ya bi muwekîlê xwe re duh çûn Gemlîka Bursayê. Lê bi hinceta koster xerabe ye hevdîtin hate astengkirin. Di nêzîkbûna 20'ê îlonê de astengkirina vê hevdîtinê pirsa; 'gelo Hikûmeta AKP'ê şer dixwaze?' anî rojevê. KCK û KONGRA GEL li ser bangewaziya Ocalan di 13'ê tebaxê de biryara bêçalakîtiyê girtibû û qewlê bêçalakîtiyê 20'ê îlonê bi dawî dibe.

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Cengîz Çiçek, Mehdî Oztuzun, Sebahattîn Kaya, bi boneya bi muwekîlê hevdîtinê pêk bînin serî li Dozgeriya Komarê ya Gemlîkê û Midûriyeta Girtîgehê Tîpa F a Îmraliyê dan. Rayedar, bi telefonê li parêzeran geriyan û diyar kirin ku koster xerabeye û dê nikaribin biçin Îmraliyê. Li ser vê yekê parêzeran pirsa "Em ê kengî karibin biçin" pirsîn û bersiva "Çarşemê koster xerabe ye. Ji bo roja înê hûn biçin an na em ê piştre we agahdar bikin" girtin.

Di van rojên krîtîk de astengkirina hevdîtina parêzeran a bi Ocalan re girîng e. Lewre Rêberê PKK'ê Ocalan beriya 13'ê tebaxê peyama bêçalakîtiyê dabû KCK û KONGRA GEL. Û wan jî li ser daxwaza Ocalan ji 13'ê tebaxê heta 20'ê îlonê biryara bêçalakîtiyê dabû. Di vê pêvajoyê de ligel ku zêdetirî 20 gerîlayan hatin qetilkirin, dîsa jî siyaseta kurd li ser biryara xwe ya bêçalakîtiyê ma.

Her wiha di serî de saziyên sivîl ên Kurdistanê û gelek rewşenbîr û nivîskaran jî bi heman mebestê banga bêçalakîtiyê kiribû û anî bû ziman ku ji bo serkeftina vê pêvajoyê ji Ocalan sûd bê girtin.

Tê zanîn ku di destpêka meha Remezanê de siyaseta kurd dê bersiv dabûya bangewaziya Ocalan lê ji ber ku hevdîtina parêzaran a di arefeya meha Remazanê de bi heman hincetê hatibû astengkirin, KCK û KONGRA GEL jî bendewarî hevdîtina bi Ocalan re mabûn.



Li ser vê yekê ligel ku hincata xerabûna kosterê hatibû nîşandan, Wezarareta Edaletê kosterek kirêkiribû parêzer bi koskera hatiye kirêkirin çûbûn Îmraliyê. Parêzerên Ocalan di 13'ê tebaxê de çûn Îmraliyê û heman rojê KCK û KONGRA GEL piştî pêkhatina hevdîtinê biryara xwe ya bêçalakîtiyê bi raya giştî re parve kir.

Qewlê biryara bêçalakîtiyê ya KCK û KONGRA GEL di 20'ê îlonê de bi dawî dibe. Ligel ku di vê pêvajoyê de tu bersivên erênî yên ji bo şertên siyaseta kurd nehatine dayîn, zêdetirî 20 gerîlayan jî hatin qetilkirin. Siyaseta kurd, 4 şert danîbûn ber Hikûmeta AKP'ê: Rawestandina operasyonan, serbestberdana siyasetmedarên kurd, daxistina benda hilbijartinê û başkirina şert û mercên Ocalan û rê li ber vekerina ji bo mûzakereyan.

Di pêvajoyê de Hikûmeta AKP'ê ev şert bê bersiv hiştin û ji bo demekê înkar kir ku ji bo ku biryara bêçalakîtiyê bê girtin tu hevdîtin bi Ocalan re pêk neanîne. Lê siyaseta kurd piştrast kir ku hevdîtin pêkanîne. Ocalan herî dawî di hevpeyvîna daye Rojnameya Akşamê de anî ziman ku komeke sivîl di çarçoveya mûzakereyan de bi wî re hevdîtinan pêk tînin.

Ocalan di hevdîtina xwe ya hefteya borî ya bi parêzeran re de anî bû ziman ku heta niha hin hevdîtin bi wî re pêk hatine û bendewar e ku hevdîtineke din jî pêk bê. Di pêvajoyeke wisa krîtîk de astengkirina hevdîtina parêzeran a bi Ocalan re bû sedemê gumanan. Hikûmeta AKP'ê dema bixwaze dikare kosteran kirîbike û hevdîtinan bide pêk anîn çima ev hevdîtin astengkir sedemê fikarê ye. Pirsa tê kirin; 'gelo Hikûmeta AKP'ê şer dixwaze?' ye.

# Komîsyona Aqilmendan li Amedê bû

**AMED** - Heyata di bin rêbertiya Serokomarê Fînlandiyayê yê bêr û xwediyê Xelata Aştiyê ya Nobelê Marttî Ahtîsaarî "Komîsyona Aqilmendan" Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr ziyaret kir. Baydemir, diyar kir ku ji bo çareseriya pirgirêka kurd hemû rêbazên ewlehî hatin bikaranîn û çareserî diyalog û muzekere ye.

Heyata "Kosmîsyona Aqilmendan" a di bin rêbertiya Serokomarê Fînlandiyayê yê bêrê û xwediyê Xelata Aştiyê ya Nobelê Marttî Ahtîsaarî yê piştgiriyê dide Tirkiyeyê da ku tevlî Yekitiya Ewropayê bibe hatin Amedê. Ji bilî Ahtîsaarî Raportorê Komîsyon û Musteşarê Wezîrê Karên Derva yê berê yê Avusturyayê Albert Rohan, Endamê Komîsyonê û Wezîrê Karên Derva yê berê yê Îspanyayê Marce Îno Oreja Aguirre, Şewirmendê taybet ê Marttî Ahtîsaarî Rîikka Marjamakî û Sekretera Giştî ya Waqfa Topluma Açik Gokçe Tuyluoglu cih digirin. Heyetê, berê Waliyê Amedê Mustafa Toprak ziyaret kir û nêzî saetekê bi Toprak re hevdîtin kirin.

Ahtîsaarî, der barê ziyaretê de tu agahiyên zelal nedan û anî ziman ku dê têkildarî xebatên kirine de li Stenbolê bi daxuyaniyekê aşkera bikin. Walî Toprak, ji ber ziyareta komîsyonê keyfxweşiya xwe anîn ziman û hevdîtin ji çapemeniyê re girtî berdevam kir.



**Girîngiya muzakereyan**

Heyetê piştî ziyareta Walîtiya Amedê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr ziyaret kir. Endamên heyetê li ber deriyê Şaredariya Bajarê Mezinê a Amedê ji aliyê Wekîlê Şaredar Metîn Kilavuz ve hat pêşwazîkirin. Baydemîr endamên komîsyonê li odeya mekamê de pêşwazî kir û ji ber ziyaretê keyfxweşiya xwe anî ziman. Baydemîr, diyar kir ku "hewcehiya bajarê ya herî lezgîn aştî ye" û gava komîsyonê ya bajar bibe wesîleya aştiyê. Baydemîr, anî ziman ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd rêbazên ewlehiyê hemû hatin bikaranîn û tu rêyên din nemane û wiha got:

"Rêbaza nehatiye ceribandin tenê diyalog, muzakere û îstişare ye. Ji ber vê yekê em dixwazin ku ev rêbaz dest pê bike." Baydemîr, da zanîn ku di sed sala 21'an de şîdetê emrê xwe tijî kir û pirsgirêka kurd bi rêbazên şîdetê nayê çareserkirin. Ahtîsaarî jî têkiliyên YE û Tirkiyeyê vegotin.

# Ocalan: Me şansek da Erdogan

**STENBOL** - Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, pirsên Rojnameya Akşamê bersivandin û diyar kir ku di pêvajoya referandûmê de şansek dane Serokwezîr Erdogan û wiha got: "Eger me gotiba 'na', guhertin dê derbas nebûna. Me şansek dawiyê da Erdogan, lazim e ew vê baş bibîne." Ocalan, beriya bi dawibûna dema bêçalaktiya ku dê 20'ê îlonê de dawî lê we re, xwest ku hikûmet gav bavêje û wiha pêde çû: "Piştî referandûmê di navbera 13-20'ê îlonê dê hin tişt zelal bibin. Eger heta wê demê tu pêşveçûyîn pêkneyên, ez berpisyariyê nagirim ser xwe. Eger hikûmet hin gavan bavêje, ez jî dê hewl bidim ku rola xwe bilîzim."

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, li Girtîgeha Îmraliyê pirsên rojnamevana Rojnameya Akşamê Ozlem Akarsu Çelîk, yên bersivandin û têkildarî mijarên wekî referandûm, muxatabî, hevdîtinên bi dewlet-hikûmetê de peyamên girîng dan. Ocalan, diyar kir ku ji roja ew anîne Îmraliyê heta niha gelek caran bi rayedaran re hevdîtin pêkaniye û da zanîn ku niha jî ev hevdîtin didomin. Ocalan têkildarî hevdîtan de ev tişt gotin: "Di demên destpêkê de ekîben leşkerî bi min re zêdetirî, li ser mijarên îstixbarî dixwestin hevdîtinê pêkbînin. Ekiba ku di van demên dawî de bi min re hevdîtina pêktîne, ekîbekê sivîl e. Hevdîtin zêdetirî wekî diyalogan pêk ten." Ocalan, bi lêv kir ku hevdîtinên bi wî re pêk tên di astek diyar de hêj didomin û ya girîng ew e ku dewletê gavên samîmî û baş bavêje.

Ocalan, nêrînên xwe yên têkildarî referandûm û "boykotê" jî anî ziman û wiha domand: "Rast e, me bi boneya spartina çareseriya demokratîk a ji Komara Tirkiye û hikûmeta wê re biryara boykotê girt. Eger me bixwesta hikûmet dê di referandûmê de têk biçûya. Eger me gotiba 'Na' pakêt di referandmê de ne dihate qebûlkirin. Me şansek dawiyê da Erdogan, lazim e ew vê baş bibîne. Ez hêvîdarim ku piştî vê, ji bo mekeqanûnek demokratîk û çareseriya demokratîk pêşveçûyînên baş pêk werin."

Ocalan, anî ziman ku tiştê ku dê tevkariyê bide çareseriyê, guhertina hişmendiyên berê ye û ji bo çareseriya pirsgirêkên dîrokî yên wekî pirsgirêka kurd, lazime pêşiyê hişmendiyên psîkolojîk yên berê bên guhertin. Ocalan bilêv kir ku eger hevdîtin qut bibin tişkekî ku ez bikim namîne.

# Pinar Sag aştî xwest dozgeriyê jî ceza xwest

**DÊRSIM** - Der barê hunermend Pinar Sag de bi hinceta par di Mihrîcana Dûzgûn Baba ya ku li navçeya Qislê ya Dêrsimê de, di konserê de gotibû "Êdî bila li çiyayên me şer çênebe, aştî bê, tu kes nemîre. Bila êdî ev şer bi dawî bibe. Da ku em bi azadî li welatê xwe bigerin. Bila êdî aştî bê" bi îdiaya "pesnê sûc û sûcdar daye" doz lê hate vekirin û 2 sal cezayê girtîgehê tê xwestin.

Pinar Sag bi hevserê xwe Tolga Sag û parêzerên xwe re tevlî danişna li Dadgeha Asliye ya Ceza a Qisleyê bû. Piştî îfade dan, danişîn hate taloqkirin. Pinar Sag piştî danişînê diyar kir ku li vî welatî daxwaza aştiyê û parastina we û xweza û welat bi sûc tê dîtin û wiha got: "Min di jîyana xwe de li gelek welat û bajaran konser dan. Lê tenê li Tirkiyeyê der barê min de bi hinceta pensê sûc û sûcdar daye dozê hate vekirin." Sag wiha axivî: "17 kesên li Çiyayên Mercanê jiyana xwe ji dest daye tu belgeyên wan sûcdar bikin tune ne. Min di vê mijarê de parastin kir. Bila êdî tu kes nemire. Bila aştî bê vê axê."

# 178 sazî dê li dijî operasyonan bimeşin

**ENQERE** - 178 saziyên civakî yên sivîl û partiyên siyasî yên Enqereyê, li ser banga Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê, bi boneya operasyonên leşkerî bi dawî bibin û pêvajoya muzekareyan dest pê bike dê di 18'ê Îlonê de meşa aştiyê pêk bînin. Saziyên sivîl dê di meşê de bang li gelê tirk jî bikin û bixwazin ku her kes ji bo aştiyê piştgiriyê bidin wan.

Piştî KCK'ê bi boneya aştiyek mayînde di navbera 13'ê tebaxê û 20'ê îlonê de biryara bêçalakiyê da, 178 saziyên civakî yên sivîl û partiyên siyasî yên Enqereyê, li ser banga Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê, bi boneya operasyonên leşkerî yên ligel biryara bêçalakiyê ya KCK'ê didomin bi dawî bibin û pêvajoya muzekareyan dest pê bike dê meşa aştiyê pêk bînin. Saziyên ku li Qada Kolejê kom bibin, dê heta Kolana Sakaryayê bimeşin û piştî re daxuyaniyê bidin çapemeniyê.

Sazî dê bixwazin operasyon bi dawî bibin û ji bo çareseriya pirsgirêka kurd muzakere dest pê bikin. Sazî dê di meşê de pankarta mezin a "Bila operasyon bi dawî bibin, muzakere dest pê bikin" vekin û bi heman daxwazê dowîzên kurdî, tirkî û gelek zimanên din bên bilindkirin. Dîsa sazî dê di meşê de nepoxên mezin ên li ser "Aştî" dinivîse bifirînin hewa.

**Bangê li tirkan dikin**

Endamê Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê Abdullah Korkmaz, têkildarî meşê diyar kir ku KCK'ê bersivek erênî daye banga wan a 11'ê tebaxê û ji bo ku ev pêvajoya aştiyê mayinde bibe û bibe dualî dê 18'ê îlonê de meşek girseyî pêk bînin.

Korkmaz, anî ziman ku dê vê carê bang li tirkan bikin û bixwazin ku gelê tirk jî li aştiyê xwedî derkevin û piştgiriyê bidin wan. Korkmaz, anî ziman ku tenê kurd û tevgêr kurd aştiyê diparêze û wiha got: "Ji bo aştî bibe du alî em dê bang li gelê tirk jî bikin. Divê gelê tirk jî bi qasî gelê kurd li aştiyê xwedîderkeve.

**Divê fersend ji dest nereve**

Korkmaz, destnîşan kir ku dê di meşê de bang li hikûmetê jî bikin û ji hikûmetê jî bixwazin ku li hemberî vê hewldana KCK'ê be deng nemîne û ji bo çareseriya pirsgirêka kurd têkeve nava hewldanan.

Korkmaz, daxuyand ku dê bixwazin operasyon bi dawî bibin û li şûna operasyonan pêvajoya muzekareyan dest pê bike.

Korkmaz, hikûmet hişyar kir û xwest vê fersenda dawî ji destê xwe nerevînin û gavên aştiyê bavêjin.

www.arsivakurdi.org

# Li dijî kurdên êzîdî dek û dolab

**Li Iraqê dek û dolab bi dawî nabin. Derket holê ku Wezareta Pilansaziya Iraqê biryar daye ku kurdên êzîdî yên li Iraqê ne li ser neteweya kurd, wekî neteweyekê xweser cuda bên jimartin**

Keywan ESTÊRE / DIHOK - ANF



Ev demek dirêj e jimartina şêniyên Iraqê tê rojeva başûrê Kurdistanê û Iraqê. Rêveberiya Iraqê ji ber herêmên nîqaş li ser heyî yên wekî Kerkûkê her tim roja jimartina şêniyê paş de diavêt. Herî dawiyê Wezareta Plansaziyê ku bi karê jimartina şêniyan re jî mijûl dibe, diyar kir ku dê êzîdî ji kurdan cuda bêne jimartin.

Rêveberiya Iraqê gelek caran, bi taybet jimartina şêniyên Kerkûkê paş de diavêt. Ji ber nerazîbûna rayedarên başûrê Kurdistanê, Rêveberiya Iraqê diyar kir ku dê jimartina şêniyan di dema xwe de pêk bê.

**Koçberiya bi guman**

Ji beriya niha, di dema ku dê şêniyên Iraqê bihata hilbijartin de, koçberiya zêde ya ereban ber bi Kerkûkê ve balê dikişand. Partiyên Sunî û Şiî ji bo demografiya Kerkûkê biguherin, berê ereban didan Kerkûkê û bi wan milk didin kirîn. Ev yek jî kurdan dixe nava şik û gumanan.

**Hinceta bêwate**

Ev demek dirêj e ku ereb û tirkmenên li bajar û navçeyên başûrê Kurdistanê û bi taybet li Kerkûkê dijîn, ji bo hilbijartin pêk neyên, dikevin nava liv û tevgerê. Hat diyarkirin ku ereb û tirkmenên Kerkûkê diyar dikin ku gelek pirsgirêkên Kerkûkê nehatine çareserkirin. Her wiha hat ragihandin ku tirkmen û erebên Kerkûkê guhertina demografiya Kerkûkê weke hincet nîşan didin û ji jimartina şêniyên bajêr direvin. Gelek caran dîroka jimartina şêniyên Iraqê li ser daxwaza ereb û tirkmenan hatibû paş ve avêtin. Herî dawî hat diyarkirin ku dê jimartin 24'ê cotmeha îsal pêk bê.

Piştî nerazîbûnên kurdan yên li dijî vê yekê, vê carê Wezîrê Plandanînê yê Iraqê Elî Baban da diyarkirin ku dê êzîdî ji kurdan cuda bêne jimartin. Ev yek jî rê li ber nerazîbûnên kurdan vekir. Êzdiyên Başûrê Kurdistanê bi tundî biryara Rêveberiya Iraqê ku dibêje 'dê êzîdî weke neteweyekê cûda bê jimartin' rexne kirin.

Rêvebêrê Giştî yê Karûbarên Êzîdiyan ya Wezareta Olî ya Herêma Federal a Kurdistanê Xeyrî Bozanî ragihand ku biryareke xetere ye û li ser daxwaza berpirsê partiyeke biçûk a Êzdiyan li Bajarê Mûsilê bi navê Partiya Teqedumî Êzîdiyan, Wezîrê Plandanîna Iraqê Elî Baban biryar daye ku êzîdî wek neteweyeke serbixwe li Iraqê bên jimartin. Bozanî bibîr xist ku di makeqanûn a Iraqê de êzîdî jî wekî beşeka neteweya kurd in.

**Dê li dadgehê gilî bikin**

Bozanî, biryara Wezîrê Iraq Baban wekî ji nû ve erebkirin û qirkirina neteweya kurd pênase kir û ji hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê xwest ku rê li van hewldanan bên girtin. Bozanî, li ser navê mîrê êzdiyan Mîr Tehsîn Beg û Civata Ruhanî ya Êzîdiyan wiha axivî: "Em qet razî nabin ku wek neteweyeke cuda ji kurdan bên hesibandin. Ger Wezareta Plansaziyê wê biryarê betal neke û Serokatiya Herêmê û Parlamenê Kurdistanê nikaribin tiştekî bikin, em ê berê xwe bidin Dadgeha Federal a Iraqê."

# Vatîkanê Tirkiye rexne kir

ROMA / ANF - Encama referandûma li Tirkiyeyê, di qada navneteweyî de jî deng veda. Vatîkanê guhertina makeqanûn rexne kir.

Di radyoya fermî ya Vatîkanê de guhertina referandûma makeqanûn hate şîrovekirin. Li gorî şîroveyên radyoyê, her çendî referandûma makeqanûn pêk hat jî lê gelek pirsgirêk nehatine çareserkirin û Tirkiye hêj jî ji demokrasiyê pir dûr e.

Di Radyoya Vatikanê de hat gotin ku azadiya ol û bawerî hêj jî pirsgirêkeke bingehîn ya Tirkiyeyê ye û hêj jî nehatine çareserkirin.

Pisporê mafê mirovan Otmar Oehring jî ji radyoyê re axivî û diyar kir ku Tirkiye hêj jî ji Ewrûpayê pir dûr e. Oehring bibîr xist ku bi hinceta "heqareta li dijî tirkîtiyê" doz têne vekirin û wiha şîrove kir; "Di makeqanûn de gelek guhertin hatin pejirandin. Lê mirov mereq dike ka evane wê çawa pêk bên. Ji ber ku destûrên jiberiya niha jî hatin pejirandin tenê li ser kaxezê mabûn. Pirseke din ku mirov mereq dike; dê Tirkiye bi guhertina makeqanûn re ber bi ku ve biçe? Ji beriya mirov rêziknameya makeqanûn ku Serokwezîr Erdogan behs dike bibîne, mirov nikare tiştek bêje. Wê demê em dê bizanin ka Tirkiye ber bi ku ve diçe".

**Xiristiyan bi fikar in**

Li hêla din, Rêxistina Navneteweyî ya Piştgiriya bi Xiristiyanan re (CSI) ragihand ku destpêkê li Tirkiyeyê, jiyana xiristiyanê li welatên dijîn di xetereyê de ye.

Rêxistinê bal kişand ku xiristyanên li vê welatî dijî bi tundiyê re rû bi rû ne û gef li wana tê xwarin.

Rêxistinê di nava lîsteya ku xiristyan lê bi tundî û zextan re rû bi rû ne de navê Tirkikiye, Pakistan, Afganîstan û Iraqê rêz kir. Rêxistinê ji bo Tirkiyeyê vana got; "Rexmê muzakereyên Yekitiya Ewropayê û guhertina makeqanûn hê jî xiristiyanên li Tirkiyeyê nikarin bi aramî bijîn. Mînakek ya vê ku li ber çavne, di destpêka sedsala 20'î de şêniya xiristiyana ji sedî 20 bû, niha jî bûye ji sedî 0,5."

Rêxistinê diyar kir ku ew ji bo xiristiyanên li welatên îslamî dijîn ketine liv û tevgerê û ragihand ku dê 25'ê îlonê li bajarê Swîsre Bernê çalakiyek bê lidarxistin.



Îyad Alawî

## Îtîlafa Nîştîmanî û El- Iraqiye nêzî hev dibin

BEXDA - Hat ragihadin ku Îtîlafa Iraqiye diyar kiriye ku wan bi armanca avakirina hikûmeta nû ya Iraqa Federal bi Îtîlafa Nîştîmanî re li hev kiriye. Berdevkê Lîsta Iraqiye di daxuyaniyekê de diyarkirin ku ew bi Îtîlafa Nîştîmanî re di danûstandinan de ne.

Ev bi qasî 6 mehan e hilbijartin li tevahiya Iraqê pêk hatî, lê hên hêzên Iraqî li ser damezerandina hikûmeta nû li hev nekirine.

Berdevkê Lîsta Iraqiye ya ku Iyad Ellawî serkêşiya wê dike, Hanî Aşûr di daxuyaniyekê de diyar kir ku heta niha Îtîlafa Niştimanî jibo destpêkeke hevbeş tu projeyek pêşkêşî wana nekiriye û ragihand ku ew dîsa jî bi Îtîlafa Nîştîmanî re di danûstandinan de ne.

Li gorî daxuyaniya têkildarê vê mijarê hatî dayin, Îtîlafa Nîştîmanî, ji Îtîlafa Dewleta Yasa nêzîktirê Lîsteya El Iraqiye ya ku piraniya wê erebên sunî ye û serkêşiya wê Iyad Elawî dike.

# Danişîna serdema 65'emîn a NY'ê

Serokê nû yê Lijneya Giştî ya NY'ê Joseph Deiss li New Yorkê danişîna serdema 65'emîn vekir. Dîplomate swêdî Joseph Deiss diyar kir ku di hedefa wan a îsal de bi pêşketin, hawirdor û di nav pergala NY'ê reform hene.

Li gorî Deiss ligel krîza aboriyê ya dawî hê pêkan e ku 'Hedefa Pêşketina Hezar Salî' pêk bînin. Deiss dide zanîn ku pêwîstî pê heye birçîbûn ji holê bê rakirin, pêşî li mirina zarokan bê girtin û tenduristiya dayikan bê başkirin û wiha pêde diçe: "Ger samîmiyet hebe û plansaziyeke rast pêk bê bidestxistina van encaman pêkan e."

Plana 'Hedefa Pêketina Hezar Salî' ku sala 2000'î de G8'an diyar kiribû divê di sala 2015'an an de bê temamkirin. Di vê de hedef ev e ku birçîbûn û xizaniya zêde ji binî ve ji holê bê rakirin. Lijneya Giştî ya NY'ê dê dawiya vê mehê de dest pê bike.

**Ehmedînejad naçe civînê**

Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad plana beşdarbûna xwe ya civîna NY'ê ya roja 24'ê îlonê dê li ser 'bêçekîkirina nukleerî' pêk bihata betal kir. Sekreterê Giştî yê NY'ê Ban Kî Moon di daxuyaniya demeke kin berê dabû rojnamegeran de gotibû 'ew dizanibû ku Ehmedînejad gotiye ew dê beşdarê civîna roja 24'ê îlonê bibe.' Ancax Ban Kî Moon demek piştî vê daxuyaniyê agahiyek din da ajansa Reutersê û di vê de diar kir ku wî bi qasê ku fam kiriye Ehmedînejad dê beşdarê civîna mijara gotinê nebe.

Rayedarên din ên NY'ê jî heta rojek berê jî digot qey dê Ehmedînejad beşdarê civîna NY'ê ya roja 24'ê îlonê bibe. Lêbelê hê paşê ew jî pê hesiyan ku Ehmedînejad dê beşdarê civînê nebe.

Ligel vê batalkirinê jî Ehmedînejad ji bo ku dê hefteya li pêş di civîna bilind ya NY'ê û di Konseya Giştî ya NY'ê de axaftin bike tê payîn ku li New Yorkê be.

Sekreterê Giştî yê NY'ê diyar kir ku pêkane ew bi Ehmedînejad re hevdîtin bike. Diyar kir ku heke hevdîtin pêk bê dê li ser bernameya nukleerî ya Îranê rawestin.



Feleknas Uca
feleknasuca@web.de



## Di referandûmê de kî serkeftî ye?

Nivîsa min ya îro li ser referandûma 12'ê îlonê ya 2010'an e.

Beriya ku referamdûm pêk were herkes dûr û dirêj bi kesên dengdaran re ket nav têkiliyan.

Wek li Ewropayê, danûstandin bi dengderan re ji bo hemû aliyan pêwist e; berê ku destûra Lîzbonê jî ji aliyê dengdaran ve hatî bû pejirandin, danûstandinêkî berfireh bi hemwelatiyên Ewropayê re hat li derxistin.

Wek her dem partî bi hev re dikevîn nav niqaşan û her partî bi hemwelatiyên xwe re ji bo serkeftina pozîsyona xwe dikevê nav têkiliyan.

Li Ewropayê komên taybetî di nav gel de hatin damezrandin, ji bo ku hemwelatî peşniyarên xwe ji bo guhartinên destûrê amade bikin.

Danûstandin çiqas serketî bû?

Pêşniyarên gel çiqas hat pejirandin?

Û herî giring di dirûstkirina peymanan de ditina hemwelatiyan çiqas di destûran de xwe dide beriqandin?

Ev pirsên gelemperî li Tirkiyeyê divê werin jibîrkirin.

Ji ber ku li Tirkiyeyê hemû medya bi yek dengî ji bo pejirandina destûrê propoganda kirin.

Gerek em ji bîr nekin ka çima kurdan ji bo boykotê bang kirî bû.

Kurd di Destûrê de ne xwedî deng bûn;

Olên din di Destûrê de ne xwedî gotin bûn;

Benda hilbijartinê ne hat kêmkirin, qanûna partiyên siyasî ne hat guhertin û hwd.

Ez bi balkeşî çavderê referamdûmê bûm. Min daxwaz dikir ku tu provokasyon naye holê.

Ez bi salan wek çavderê hilbijartinan li cûdatirîn hereman de û herwiha li Kurdistanê jî amade bûm. Dizanim ku di hilbijartinan de rayadar hewl didin ku li hember bindestan manîpûlasyon binîn holê.; wek zext didin li ser kesên ku nikarin bixwînin û binivîsîn, da ku ew dengên xwe bidin partiyên ku bi hezên ewlekar re dixebitin.

Di vê referandûmê de bi mîlyonan kes li benda encamê bûn.

Piştê nîvro, di nûçeyan de dihat gotin ku; li Kurdistanê pir hindik kes çûne ser sendoqan.

Û hezên reyadar tevlihev bûn; eynî demê de li gund û bajaran de manîpulasyon destpê kir. Li gor çavderên referandûmê, li pir hereman de bê heq dengê êrenî ji bo referandûmê hatine dayîn. Medya hîn jî dixwaze bide xûyakirin ku, ji herêma boykotê tû deng derneketiye.

Lê dema ku mirov baş mêze bike, hejmara dengên êrenî û neyenî hatin hijmatinê; lê dengên boykotê nehitin kifşkirin. Mirov nedixwest ku dengê mîlyonan bibîne. Ma ev ne manîpulasyon e?

Di encamê de jî dibêjin ku Destûrê bi ji sedî 54 hatiye pejirandin; ma ev derewe kî dîrokî nîn e?

Nûçe dibêjin ku li Amedê ji sedî 94 Destûr pejirandine. Êatman, Wan, Colemêrg, Mêrdîn û bajarên din yên kurdan Destûr pejirandine.

Lê li ser dengên boykotê tu nûçe nahatin belavkirinê.

Li Amedê zêdeyê 650.000; li Êlihê 160.000; li Wanê zêdeyê 300.000 dengdar neçûn ser sendoqan.

Divê were pirskirin: çima ev qas kes neçûn û ketin helwesta boykotê?

Kî dikare bibêje ku ev destûr ya dengdar û gelê kurd e?

Divê di encamê de AKP û partiyên din BDP'ê wek temsîlkarê gelê kurd bipejirînin.

Herî giring jî bi BDP'ê re riya çareseriyê bigerin; ji ber ku bi boykotê BDP'ê di referandûmê de serket û BDP temsîlkarê demokratîk ya kurdan e.




# Jinên endamên KESK'ê li dijî recm û darvekirinê meşiyan

**ÎZMÎR** - Platforma Jinan a KESK'ê, bi boneya Rejîma Îranê cezayê recmê ku vegerandiye darvekirinê yê Sakîne Muhammadî Aştiyanî biriye efû bike, meşek pêk anî. Jinan, bang li hemû kesan kir û xwest li hemberî rejîma Îranê dengê xwe bilind bikin.


Endamên Platforma Jinan a KESK'ê ya Îzmîrê, bi armanca cezayê darvekirinê ku Rejîma Îranê li Sakine Mohammadî Aştiyanî biriye şermezar bike li pêş Konak Pîerê kom bûn û çalakî pêk anîn. Jinên ku li ber Konak Pîerê li hev kom bûn heta Sumerbanka kevn meşek pêk anîn. Jinan di çalakiyê de pankarta "Sakîne Mohammadî Aştiyanî ne tenê ye" vekirin û bê navber dirûşmeyên "Bijî şewirmediya jinan", "Bedena me ya me ye, dê ya me bimîne" û "Ji çewsandina zayendî, neteweyî û çandî re bes e." berz kirin. Koma jinan piştî heta Sumerbankê meşiyan li vir daxuyanî dan çapemeniyê. Li ser navê jinan Gulsen Kaplan, daxuyanî da û xwest Rejîma Îranê dest ji cezayên darvekirinê berde û Aştiyanî ya 43 salî serbest berde. Kaplan, bang li her kesî kir û xwest li hemberî darvekirina bê deng nemînin û li dijî helwesta Îranê ya cezakirinan dengê xwe bilind bikin. Kaplan, da zanîn ku wan li dijî pêkanînên dermirovanî kampanya îmzeyan daye destpêkirin û îmzeyên ku kom bikin dê di 17'ê Îlonê de ji Sefîrxaneya Îranê re bişînin.

# Jinek ji aliyê hevserê xwe ve hate qetilkirin

**STENBOL** - Li navçeya Bahçelîevlera Stenbolê jinek li rastê kolanê ji aliyê hevserê xwe ve hate qetilkirin.

Li taxa Kocasînana navçeya Bahçelîevlera Stenbolê jina bi navê Tulay M. ji aliyê hevserê xwe Yusuf Ş. ve hate qetilkirin. Hate zanîn ku Yusuf Ş. û hevsera xwe Tulay M., demek berê dest ji hev berdabûn û piştî duh li kolanê rastî hev hatin bûyer pêk hat. Hate hinbûn ku Yusuf Ş., dema li kolanê rastî hevsera xwe ya berê Tulay M. hat çeka xwe derxist û Tulay M. da ber guleyan. Li gorî şahidên bûyerê Tulay M. piştî bûyerê bi qasî 20 daqîqeyan li hêviya ambûlansê ma û heta ekîbên tenduristiyê hatin cihê bûyerê Tulay M. jiyana xwe ji dest da. Hevserê Tulay M. Yusuf Ş. jî piştî demekê li nêzîkî cihê bûyerê ji aliyê polîsan ve hate binçavkirin û ew birin Midûriyeta Polîsan a Bahçelîevlerê.

# BÎRANÎN



Haci Mehmet Siddik SARILI
16.09.2008

*Te gulek çand*
*Di nav gulîstana*
*jiyanê de*
*Ew gul hezkirina te bû*
*Heta ku jîn û jiyan bi*
*dawî nebe*
*Dê hezkirina te di dilê*
*me de be*
*Tu, tu car nayêyî*
*jibîrkirin*
*Ciye te bihuşta*
*narîn be...*

**Zarokên wî Ertan, Seyît, Rûşen, Suna, Berfîn, Rûken û hevsera wî Hediye SARILI**

# Jinên nebînî yekem car rapora tematîk dan CEDAW'ê

Federasyona Nebîneyan a Tirkiyeyê ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinên astengdêrên dîtinê gelek komxebat lidarxistine. Ferderasyon yekem car têkildarî pirsgirêkên jinan ji CEDAW'ê re raporek tematîk pêşkeş kir



**ENQERE / DÎHA** - Federasyona Nebîneyan a Tirkiyeyê ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên nebîneyan gelek xebatan dike, têkildarî pirsgirêkên jinên asnebînî, ji Komîteya Ji Holê Rakirina Cudakariyên li Hemberî Jinê ya YN'ê (CEDAW) re rapora tematîk pêşkeş kir. Seroka Komîsyona Jinan a Federasyona Nebîneyan a Tirkiyeyê Psîkolog Şule Sepîn, diyar kir ku di raporê pirsgirêkên jinan û rêyên çareseriya wê cih digirin.

Federasyona Nebîneyan a Tirkiyeyê ya bi deh hezaran endamên wê hene, di nava 5 salên dawî de ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinên astengdêrên dîtinê gelek komxebat lidarxistine, yekem car têkildarî pirsgirêkên jinan ji CEDAW'ê re raporek tematîk pêşkeş kir. Seroka Komîsyona Jinan û Federasyona Nebîneyan a Tirkiyeyê Psîkolog Şule Sepîn, diyar kir ku wan beriya niha ji bo mafên jinan perwerde daye 50 jinan û her wiha ji bo hişmendiyê jî bidin jinên astengdêrên dîtinê ji aliyê Komela 6 Nokteyan a Koreyan ku girêdayî federasyonê ye, Kovara Kîbele derxistine.

**Rapor rastî eleqeyek hat**

Sepîn, da zanîn ku rapora têkildarî pirsgirêkên jinên nebînî di 46'emîn Civîna Jinê ya ji aliyê CEDAW'ê ve hatibû organîzekirin de pêşkeşî CEDAW'ê kiriye. Sepîn, anî ziman ku civîn di navera 15-23 tîrmehê de li paytexta Amerîkayê New Yorkê hatiye lidarxistin û rapora wan rastî eleqeyek gelek baş hatiye. Sepîn, di berdewamê de bi lêv kir ku gelek mijarên têkildarî pirsgirêkên jinan û rêyên çareseriyê di rapora wan de cih girtine.

# Gelo dayika 12 zarokan ji ber sersariya bijîşkan mir?



**RIHA / DÎHA** - Hate îdiakirin ku dayika 12 zarokan Raîfe Ozgul a ducanî ku ji ber xwîn jê çû, ew rakirin Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Rihayê, ji ber sersariya bijîşkên nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye. Ji bo sedema rast a mirina Ozgul tespît bikin cenaze şandin Saziya Tiba Edlî ya Edeneyê. Malbatê îdia kir ku Ozgul ji ber sersariya bijîşkan jiyana xwe ji dest daye.

Dayika 12 zarokan Raîfe Ozgul a 40 salî ku li gundê Heciler ê navçeya Hewagê rûdinê li ser jan û êşê rakirin Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Rihayê. Ozgul, piştî rakirin nexweşxaneyê, li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Hevserê Ozgul Kadîr Ozgul duh saet di 14.00'an de li ser êş û janan hevsera xwe Ozgul bir Ocaxa Tenduristiye ya Bajaroka Yalaxê. Rayedarên tenduristiyê li vir Ozgul sewqî Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Rihayê kirin. Piştî Ozgul anîn Nexweşxaneya Lêkolînê ya Rihayê birin beşa lezgînî û mudaxaleya tibî kirin. Piştre bijîşkan got xwîn sekinî û ew sewqî beşa întaniyeyê kirin. Piştî 13 saetan serûma bi Ozgul ve hatibû girêdan rawestiya û dîsa ew rakirin beşa lezgînî. Li vir ji xiztin bin kontorlê. Beriya ku Ozgul têxin ameliyatê Ozgul li vir jiyana xwe ji dest da. Piştre ji bo sedema rast a mirina Ozgul tespît bê kirin cenaze şandin Saziya Tiba Edlî ya Edeneyê. Hevserê Ozgul Kadir Ozgul, bertek nîşanî helwesta rayedarên tenduristiye da û diyar kir ku hevsera wî ji ber sersariya bijîşkan jiyana xwe ji dest daye.

**Serlêdana sûc kir**

Piştî bûyerê hevserê Ozgul Kadir Ozgul, bi boneya sedema mirinê zelal bibe û rayedar hesapê vê yekê bidin der barê rayedarên nexweşxaneyê de li Dozgeriya Komarê ya Rihayê serlêdana suç kir.

Birayê Ozgul Îbrahîm Taş ji anî ziman ku xwişka wî ji ber sersariya bijîşkan jiyana xwe ji dest daye û 12 zarokên wê sêwî mane.

Li ser îdiayan Serhekîmê Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Rihayê, Opr. Dr. Ahmet Çakir, diyar kir ku dê têkildarî mijarê lêklîn bikin û piştre agahiyan bidin.

www.arsivakurd.org

# Ji pencereya Adorno sêyrûsefera dîrokçeya hunerê

## Huner, di hundir civaka ku têdeye de tenê bi dana naskirina wê na, bi rexnekirin û asta veguhartina wê, bi potansiyelek giştî girîngiya xwe digire. Xwe zindî dihêle

ZÎN EVÎNAWELAT



Çand û huner ji serdemên kevn û heta niha bûye qada beşekî fikirmendî ya herî girîng. Lê belê asta çandî ya ku derketiye plana pêş û bûye qada rexnekirinê, bi taybet jî ev piştî şerê cîhanê yê duyemîn di berhema de tê diyar kirin. Elbet sedema vê ya yekem kapîtalîzma dereng mayî ye. Di berhema 'diyalektîka ronakbîriyê de' di beşa 'Endustriya Çand' a ronakbîriya xapandina girseyî de têgîna 'Endustriya Çand' ne teoriyekê çandî, ji bo teoriyekê endustrî pêş bikeve tê bikaranîn. Aliyê 'Endustriya Çand' yê ku Adorno rexne dike, rexê wê yê dana xapandinê ye. Di bingeha van rexneyan de cardin fetîşîzma meta ya Marx'î jî radizê. Li gorî Adorno'yî, endustriya ku di aliyê çand de pêş dikeve, berhemên meta yên hunerî ne, hîn di destpêka xwe de ji bo sûkê bazirganiya metayê ku hatin berhem kirinê ne. Cardin di rexneya civaka modern de bi navê çanda endustrî, an jî endustriya populer de, bi giştî di têgihîna çanda girseyî giştî de, ya ku derdikeve plana pêş ew kapîtalîzma dereng ya tenê bi ne pêşketina aboriyê nayê îfade kirin heye. Yek ji van taybetmendiyan, aliyê dagirkerî û hegemonîk yên civakî di asta çand a herî jor de ji aliyê pergalê ve bikaranîn e. Her roj ev yek hîn zêdetir dibe.

***Endustriya Çand:*** Di yekparebûna pergalê de, ji bo hebûna kesayet îdame bike, keda wî, hebûn û aqlê wî ji bo pergalê kirê dike. Ev yek dihêle ku kesayet ji pergalê xerîb ne keve. Bi hevrebûna giştî her tim tê bikaranîn. Coşî di dema kapîtalîzma derengmayî de dibe dirêjiya wê bixwe. Kirdeyê modern, ne tenê di dema xebitandinê de, herî zêde di dema coş û kêfxweşiyê de radest dibe. Di têkel de, hemû çanda girseyî hevreng e. Ji ber ku dijwarî pêş dikeve hêza wê jî zêde dibe. Di wê demê de, ti têkildariyek sînema û radyo bi hunerê re namîne. Ew dibin beşekî karê jiyanî. Dibe birdoziya tewşo mewşo ya ku tê erê kirin. Êdî endustriya çand bi gotinên teknolojîkde tên ravekirin. Bi milyonan însan pêdiviyên xwe li gorî vê yekê bi kar tînin. Afirandina hemû kar û mal dibe hevrengiya vê zanebûnê û bi awayekî xwezayî tê bikaranîn. Hela bi hejmarek kêm a navendê berhema, bi xalên zêde û li her deverî cihbûyî de ev bi awayekî giştî bi rêxistin dike. Ev yek dibe mecbûriyet. Cardin, hemû standard li gorî pêdiviyên xerîdar tên bikaranîn, li hemberî xwe kêm mixalefet dibînin. Ev nêrîn bi rehetî tê diyar kirin. Bi qasî hêza teknolojiyê ku li ser girse tê bikaranîn û behsa wê tê kirin, behsa berhemgerê vê teknolojiyê nayê kirin. Aqilmendiya teknolojîk, di heman demê de aqilmendiya serweriyê ye. Însanê modern dibe kolêyê berhemên xwe.

***Li gorî Adorno û Horkheîmer:*** 'Aliyên xitabî qalîbê berhemê xerîdariyê cuda dikin, heman mal bi buha û şêweyên cuda tên firotin. Ev bi piranî tê diyar kirin. Kes derveyî pergalê namîne. Êdî her kes dibe beşekî wê yekbûnê. Dema temaşevanekî sînema, fîlmekî temaşe dike dizane ku di encama fîlmê de, kî tê xelat kirin, kuştin an dadgeh kirin. Vê yekê pir baş dizane. Guhdarvanekî muzîkhez, li gor guhê xwe bi pergalê ve girêdayî an jî guhê ku ji aliyê piyasayê ve hatiye çêkirinê stranekî ku 'hît' bûye bi gotinekî din gelek navdar bûye guhdar dike, di pey gotinekê de çi gotin tê baş dizane. Bi vê jî kêfxweş dibe. Pêşketina Endustriya Çand, bandora efekta ya rasterast û ziraviyên teknîkê dihêle serweriya li ser çandê pêş bikeve. Jiyana rastî dibe beşekî ji beşê vê hunerê. Ew fîlm, ji wî temaşevanê ku refleksa xwe ya nêrîn dayinê winda kiriye re, fersenda xeyal kirinê nahêle. Bi vî awahî ew fîlm, temaşevan ji rastiya wî dûr dixe û dixe nav mecbûriyeta yek rengiya xwe. Endustriya Çandî kesayeta modern ya ku wek xwe di afirîne dike endamê xwe. Ji bo ku hunermend bi karibe li ser linga bimîne di nav mecbûriyeta li hevkirina vê yekê de dimîne. Muxalefetek rastî, di cîhana kar de dibe ya xwedî vê fikra cuda ango ji rastiya xwe dûr. Di civaka modern de tawanbariyê ku tên kirin, bi awayekî aşkera derdikevin holê. Lê her çiqas ev tawanbarî bi awayekî aşkera tên diyar kirin jî, di encam de li gor nêrîna giştî ya tê bihûrandin tên bersivdan. Di navbera pêşeng û koroyekê de çiqas berkendal hebin, li gor vê daneyê kesên xweseriya xwe di çand de daye îfadekirin, di asta herî jor de bi îhtîmalekî mezin cih digire. Cudabûna di vir de li gor buhaya bilind tê radest kirin'.

Li gorî Adorno û Horkheîmer, pergala serdema endustriyê bedenê serbest dihêle û êrîşî ruh dike. Êdî sazûmanî nabêje ' An wek min bi fikire an jî tune bibe'. Dibêje 'Tu serbestî ku wek min ne fikirî. Tu dikarî jiyana xwe û tiştên hemû ayidê xwe biparêzî. Lê piştî wê demê şûnde, di nav me de tu biyanî yî'. Kirdeya modern, ji ber dibe kirdeya moderniteyê bixwe, êdî ji wir şûnde ne modern e. Ji ber ku ew kirdeya modern di afirîne, modern e. Di roja me de, çand û kêfxweşî tevlihevkirin tenê nabe sedema ji rê derxistina çandî, di heman demê de dibe sedema ku çand bi aliyê bîrewerî de were veguhartin. Şibandina kar û kêfxweşiyê li ser bingeha herdûya di yek status quo (statukoyê ) de pêş dikeve. Zewq girtin tê wateya ji pergalê re erêgotin. Însan wek mînaka nifş, di Endustriya Çand de rastiya xwe digire. Di roja me de, mirov dikare bikeve cihê yekî din û ev rastî girîngî digire. Mirov dikarin cihê hevdû dagirin, lewma dibin wek kopiyê hevdû. Kirdeya modern dibe kirdeya sîberê. Dibe kirdeya dîjîtal. Di vê derbarê de bi nêrînê Adorno û Horkheîmer re girêdayî hevalbendê wan ê navdar jî bi nêrînê xwe yê fîlozofî Heîdegger der barê hebûnê de van nêrîna parvedike.

"Derfetê jiyana rojanê li gor pîvanên ku 'yên din' datînin tê birêvebirin. Ev 'yên din' ne kesên diyar in. Her 'yekî yê' din dikare bikeve cihê herkesî. (…) nasnameya 'yê din', ne ev kes, ne ew kese, ne jî çend kes bi xwene. Eve yekbûna hemûya ne. Nasnama wan an 'bêkesbûne' an jî 'herkes e'."

Di serdema Endustriya Çand de, kesayet şehitînahîsê (yanilsama) bixwe ye. Lê sedemê vê ne tenê amûrên berhemê û standardbûna wan e. Xweragirtineke tenê di aliyê kesayet de, bi wê re bibe yek şert û merc tên bikaranîn. Kesayet di wir de êdî kesayetekî sexte ye. Kesayeta modern, dibe berhemekî ku hertim tê afirandin. Benjamîn, di hunerê xwe de behsa 'windakirina xêle(hale)' dike. Di rastiya xwe de ji bo vî kesayetê modern ev gotin derbas dibe. Êdî ji wir şûnde xêleya kesayet namîne.

Adorno Endustriya Çand û huner bi hevdûre digire dest. Di ramana wî de çand û civak, ne di pêşiya sentezekî mûtlaq de ye, derveyî armanca yekbûnê bi diyalektîkek negatîf wekî di aliyê dijî hev tê bicihkirin. Huner û civakê wek diyardeyê dijminê hev dinirxîne. Hunerê wek daneyê ku xwe radest nake, her tim wek nêrînê 'yê din' tê fikrandin dixebite bibîne. Lê cardin aliyê civakê yê ku xwe wek beşekê vê dibîne, derdixe holê û ji vê nêrînê nareve. Dibistana, di navbera çand û huner de wek diyalektîka'dijminahî' di heman demê de cihê bêhêvîtî û dilsariyê bi dest digre. Çand û hêviyê, civak û dilsariyê her çiqas di heman wateyê de nede diyar kirin jî, nêzî hevdû dibîne. Tu carî bê alîgirî namîne. Bi hemû vîna xwe di aliyê hêviyê de, her wiha di aliyê huner de cih digire. Bi aqilmendiya xwe jî, gelek caran wê hêza civakê ya dilsariyê dide nîşandan û daneyê wê wek hêzekî ku bin nakeve hesab nake. Teza Adorno ya bihgehîn: Huner di aliyê pişkî(tîkel) de û di aliyê giştî de bi sînor jî be, di kare xweseriya xwe bi parêze. Huner qada xeyal, hêvî, utopya yên însan, berhevkirin û zindîkirinê ye. Bê guman ev jî ne kêm e. Xala di nav vê serweriyê de ya herî lewaz, cihê ku hêvî têde ji nû ve dipişkive ye. Qada herî bi behrem e. Huner li hember hemû şaişiyan dibe qada yekbûna herî bi hêz.

Huner ji civaka îro wêdetir, ji bo civaka din bêrikirina xwe û hebûna xwe biparêze dibe parastgeha bingehîn. Heta ku xweseriya wê hebe, di nav civakê de, ji wê civaka ku nikare hebûna xwe bi domîne. Di vê wateyê de, di nav wê civaka ku têde cih digire de, hem di aliyê hundirîn de û hem jî di aliyê derve de dikeve asta rexnekirinê. Hem jî di aliyê devre de bi xeyalên xwe yên pêşerojê mafê xwe yê 'yên dîtir' veşartî dihêle, rewşa xwe ya rexne kirina giştî jî bikar tîne. Ev cihê ku wateya însan ya rewa ye, dibe îfadeya kêfxweşiya pêşeroja mafdar. Huner bi gotina Stendhal "Une promesse de bonheur" ango 'ji ber ku di hembêza xwe de kêfxweşiya pêşerojê radigre huner e'.

Taybetmendiya hunerê aliyê wê yê neyênî, ji kokena civakbûnê tê. Huner, civaka ku têde dijî re dibe dij-teza civakî ya giştî. Civakbûna hunerî, ne ji erdema wê pêvajoya tê jiyîn û ne jî, ji naveroka kokena civakê çavkaniyê xwe digire. Huner civakî ye. Ji ber di nav wê civaka ku cih digire de rewşa muxalif digire. Ji bo vê astê bigire, pîvanek heye, ew jî xweseriya huner e. Di civaka pre-kapîtalîst de cihê hunermend, rasterast bi afirandina berhemê ku bi hin sazî û dezgeha ve girêdayî, her wiha bi asta aborî ve girêdayî pêş dikeve. Di civaka kapîtalîst de têkildariya bendîtî(bagimlilik) bi piyasayê ve girêdayî ji ber ku pêşdikeve em dikarin behsa cihê huner û hunermendiya kapîtalîst bikin.

Huner, di hundir civaka ku têde ye de tenê bi dana naskirina wê na, bi rexnekirin û asta veguhartina wê, bi potansiyelek giştî girîngiya xwe digire. Ger bi rastî jî, huner ewqasî civakî ye, berî her tiştî di navbera huner û zanistê de an jî di navbera huner û siyasetê de hiyerarşiya ku hatiye avakirin pêwîst e mirov bibîne û di heman demê de di navbera civaknasiya huner û estetîk de an jî di navbera huner û quramê ku tê bikaranîn de cûdabûnekê çêbike. Ger ev nebe, çêkirina van cudabûna gelek zor dibe.

***Civaknasiya Hunerî:*** Di aliyekî de, di navbera civak û hunerê de têkildariya ku heye çawa hatiye krîstalîze kirinê lêkolîn dike. Di aliyê din de ji bo ew berhema hunerî were fêhmkirin û di her deverî de were belav kirin û kontrol kirin mekanîzmayê ku hatine avakirin lêdikole.

Ji bo Adorno civaknasî û rexnekirin ji hevdû qut nabin. Lêkolîna berhemekî hunerî, pêwîstiya şêweya wê ya şîrovê jî dike. Ev lêkolîn, ji dema avakirina berhemê û heta encama dawî hemû pêvajoyê radigre. Di heman demê de ev huner û çêkirina vê hunerê, pêvajoya civakî û hemû têkiliyê wê civakî pêwîst e berbiçav were girtin. Ew hunera ku ewqas xwedî potansiyelek mezine, van bendewariya çawa dikare bibersivîne? An jî kîjan huner dikare vê biser bixe? Bersiva Adorno modernîzm e.

Ji bo Adorno xweserî û civakbûyîna huner di taybetiyên ku jê nayê revandinde ye. Her çiqas wek dijberê hev diyarin jî, ya rastî û encax bi hevdûre hene. Bi gotineke din, hunera civakbûyî bi xweseriya xwe û bi xweseriya civakbûna xwe ve girêdayî ye. Ger yek nebe yê din jî nabe. Ji ber vê Adorno hertim li dijî nêrînê ku van taybetiya red dikin di sekine û van meyla na dipejirîne. Adorno û hindek Frankfûrtvanê din, dema hin meylên ku hunerê civakbûnê wek firaksiyon li aliyekî dihêlin rexne dike, ji aliyê din de, dikeve nav hesab xwestina ji rastiya Marksîst a ku vê xweseriya hunerê dûrî çav dikin an jî di wateya giştî de dikeve nav hesab xwestina helwesta Marksîzma Ortodoks yê ku bi estetîkê radibe.

*Çavkanî: Besîm F. Dellaloglu*

### Adorno kî ye?



Adorno bi navê Teddîe, malbat û dostê wî bang dikirinê. Zarokê Oscar Wîesengrûnd û Marîs Calvellî ji Korsîka, ye. Îro fîlozofê bi navê Adorno ku em nas dikin, paşnavê xwe yê bav Wîesengrûnd bikar ne aniye, paşnavê dayika xwe yê keçkanî Adorno girtiye. Sedemê vê yekê ji ber rewşa 1930'ya Almanyayê ye. Meylekî dayika Adorno û xaltîka wî cidî bi muzîkê re heye. Di demek dirêj de ji hunermenda wê demê Adelîna Pattî 're bi dengê xwe hevaltî kiriye. Her wiha biçûkbûna Teddîe di temenekî biçûk de hertim bi muzîkê derbas bûye. Adorno di 15 saliya xwe de bi dostê malbata xwe û Sîegfrîed Kracaûer're, li ser felsefa klasîk ya Almana û bi taybet Kant disekine. Dest bi xwendina wan dike. Bi vî awahî berê xwe dide kûrbûn û mijûldariya felsefeya kûr. Adorno di sala 1921 de, li Frankfurtê dibistana Kaîser Wîlhelm xelas dike. Di zanîngehê de bi giranî dersê felsefe, civaknasî, derûnî û muzîkêdi xwîne. Di sala 1922 de navdariya bijîşkiya felsefe digire. Mamosteyê Adorno yê tezê, fikirmend Kant'van Hans Cornelîûs'e. Di sala 1922 de, di semînerek Cornelîûs'de Max Horkheîmer nas dike. Di bin şêwirmendiya Cornelîûs de li ser Freûd dest bi kûrbûnê dike. Tiştê ku Adorno kir, tiştê ku Benjamîn ne kiribû. Teza nû ya Kîerkegaard bû. Dibistana Frankfûrt re têkîliyên xwe çêdike. Adorno di 1938'an de dibe endamê enstîtuyê. Di sala 1969 de di li Swêdê ji ber krîza dil jiyana xwe ji dest dide.

www.arsivakurdi.org

# Hêvî her tim heye -II-

AZÎMA TOLHILDAN

Hîn wê demê ez şervanekî nû bûm û salek derbas bûbû bi ser tevlibûna min a li nav refên şoreşê re û ez jî yek ji wan hevalê ku amedehiya kongireya jinê dikirin bûm û min wekî endamekî cihê xwe di nava kongirê de wê demê digirt. Asta coş û heyecana heyî hem di milê bîrdozî û siyasî de û hem di milê kar û xebatê leşkerî û jiyanî de jî, xwe li her qadê dida diyarkirin û pir bilind bû. Her çiqasî ji milekî ve xeberê derketina operasyonê ji her milîve dihatin û ji milekî din ve jî, amedekariyê damezirandina kongirê dihatin meşandin. Lê dibe ku we re pirskirin çawe ji milekî ve haziriyên kongirê dihatin kirin û pê re jî amedekariyê operasyonê jî li holê hebûn?



Bi rastî heval di hawayeke cuda de bûn û te tiştekî cuda di rûyê hevalan de ferqnedikir. Hemû hevalê jin tevli kongirê bûn, ji xwe gelek hevalên di asta navendî de hatibûn û ew jî tevli kongirê bûn. Ji ber ku ew kongirê yekemîn ê jinê bû ku dihate kirin û asta coş û heyecana xwe cuda bû. Kongirê derdorî 8 rojan berdewamkir, wê demê bihar bû û em di meha adarê debûn û di roja 21'ê wê de bûn.

Di wê navberê de me agahiya derketina operasyonê girt û birengekî lezûbez belakirina hevalan hate çêkirin. Hemû hevalên jin bi coş û biryarekî mezin berê xwe didane çeperê xwe. Hijmara hevalan wê demê pir zêde bû. Ji ber ku hem hevalên kongira 5' emîn yê PKK'ê û kongirê yekemîn yê jinê bi hev re bidawî bû û hemû heval komî ser hev bûbûn û di wê astê de em hemû hevalê li wê derê amade em çûn ser karê xwe.

Ji sînorê Heftenînê bigire û heyanî Qaşûra, Colemergê û rexê Zaxrosê li van hemû qadan hevalan li hêzên dijmin dan

Her çiqasî min zehmetiyên fizîkî dikşandin jî. Lê me hevalê jin bi xwe amedehiyên heyî dikirin. Bi taybet birina fîşekên Doşkayê û şixulandina wê. Herçiqasî erdîngariya heyî pir zor û zehmetiyên xwe jî hebûn. Lê ji bona ku em serkeftinê bi destê xwe bêxin, me her tişt danîbû li ber çavên xwe.

Dema ku dijmin derket operasyonê, hêvî nedikir ku wê rastî ewqas berxwedan û seknandina bi heybet ya Gerîleyan were. Ji ber ku dijmin tucaran texmîn nedikir ku haziriyên gerîla di wê astêde ne û wan ji xwe re digotin herkes bi haziriyê kongirê ve mijûl dibe û em ê wan di nava xefletê de bigirin û em ê wan di nava xaka Başûr de tesfiye bikin. Lê mixabin berûvajî wê derkete hole. Ji ber ku asta berxwdan û şerkirina hemû hevalan pir xurtbû û hîn dijmin sînor derbasnekirî hevalan ji her milî ve lêxistin.

Ji sînorê Heftenînê bigire û heyanî Qaşûra, Colemergê û rexê Zaxrosê li van hemû qadan hevalan li hêzên dijmin dan.

Lê giraniya operasyonê di milê Heftenîn û Metîna de bû. Tê bîran min di lêdana yekemîn de û çiqa ku wê demê perf jî li erdê hebû û ji milê hewayê ve şert û mercên pir zor û zehmet peyda dibûn. Lê rexmî wan zehmetiyan jî hevalan qet gav bi şûn ve nedavêtin.

Di wê navberê de û di dema pevçûnan de salox ji mere hat ku 11 hevalê me birîndar bûne. Yek ji wan hevalan piştî demekî kurt şehîd ket. Ji ber ku di serê xwe de birîndarbûbû û birîna wî giranbû.

Navê wî Kawa Amûdê bû, ew heval di wê operasyonêde şehîd ket. Ji ber wê çiqas ku şertûmercên heyî pir zor û zehmetbûn, lê hemû hevalan cihê xwe di lûtkeyên bilin de digirtin û hemûyan bi rihê berxwedanê li hemberî dijmin şer didane meşandin û xwedî li şehîd û birîndarê xwe derdiketin.

# Bêrîvan

EVDILKERÎM

Çemê miçiqî ji nû ve derdibû, diherikî bi nazdarî. Xiyalên me av dida bi bêhna comerdiya biharê. Sosinan pal dabûn beybûnan. Nêrgiz bi beşişînên te geş dibûn. Pîvok û bûklindêrên çavlêder bi kenê te dileyistin û kulîlkên tolgînê bi xweşîkahî û xweşxuyana te perbaskên xwe dihûnandin. Sirûşt li ser sînga bostanê biharê cih danîbû, bi mîstdana xwezaya xwezabar rûçikên xwe dişûşt ji qerşîneka zilma zivistanê. Her tişt li cihê xwe bû. Her tişt di riya xwe de bû; giya û zewat, însan û hemû maxlûqat…

Lê tu li tu deverên şênber xuya nedikirî heval; çawa ku dewran li te zivirî be, çawa ku dinya li te bûbe zelzele, bi qîr û hewaran li te digerim. Deng û awazên min xewletî û xelîştekê çiyan dida, olan dida û di cih de li min vedigeriya, destvala vedigeriya, virtivala vedigeriya…

Mixabin te nebihîst. Her min dizanî ku caw û cewherê rêhevaltiya te saxlem e, tam pê bawer bûm, lê mixabin tofan û bobelatên bêderman rabûbûn di rêbarê babîrkên razberiya ramanan de.

Min destê xwe avêt keziyên Herekolê û bîskên çiravê, qîriyam ji kûrahiya dilê xwe.

Zariya ji demekê dewrana dirbê serdema sirûda xwe. Awirên hêrsa min herdu jî lerîzandin ji lemê wan.

Tam di wê navê de nalîna birîna birûskekê ji çemê Eşik hat û ji dest û piyan ketim.

Pêlpelokên hêstîrkên kêmhewandina çiyayê Berçaç ketin himbêza mewcên Êşik…

Te pal dabû beyara berwarê Berçaçê heval. Her wekî ku tu westiyabûyî. Êşik hêj jî diherîkî bi hemû zelalbûna xwe ve.

Lê lêvên te ziwa bûbûn, te li wê ava zelal dinêrî bi çavên bêmefer.Tu ewr û ewrên lezok jî tune bûn li asîmanê bêsemyaran ku xunaveke hûûûrik dibarîne. Stêrkên stûxar di roniya çavên te de diteyîsin

Min xwe xwar kir bi rêzdarî, ew rûçikên tê yên sorgulî xistin nava kefa destê xwe de û li wê rûgeşî û madxweşiya te nihêrî. Bi şeref, min got qey tu henekan dikî lê,ku te wisa paldayî xwezayîtiya xeyalan. Em li hev bist kes bûn, qet min hêvî nedikir ku tu wisa li min bikî. Piçekî hêrs bûm, min gazî te kir," ka rabe heval, CANHEVAL, ma tu zanî ev çi wext e?"

Du-sê caran min heman bang dubare kir, lê te deng neda. Dema ku min piçekî tu vehejandî û hêj nêz ve bibaldarî li bejn û bala te ya wek taka rîhanê nêrî hêj min pê derxist tu ne henekan dikî,ger "henek"be jî heneka herî BÎJAN a heyama hikûmdarên hov in. Çavên min birije, ma çawa ji zû ve min çek û rextên te yên li derdorê belav bûyîn nedîtin?

Bi fêmkîrina rastiya herî tal re qîrînek herî biqewet ji qorziya dilê min qetiya û qefilên herikbariya çemê ÊŞÎK xistin qafo û tev qefilandi di qehra xwe de…" Bêrîvanê vedeng da li dol û dewranên dilên derdorê;Vîda vaneyên demarên domahikê hat badan,wek badekê,em li cihê xwe bûn dêvla darekî dêm perdeyek tarî û zilomet ket pêşberî me, li dîwarê reşatiya rastiya mirînê qelibîn…

Zagona zengilê zilmê çiqas bêwijdan be,çiqas hov û har be jî,nikare hûnandina hêviyên hezkirina me bişehitîne heval.

Bila qet kêfa xwe xweş nekin,ew behle û behitiyên hêc… Ji xwe te jî gotibû hevala Bêrîvan,baş tê bîra min,eynen wiha." Heya ku ez bihevoyê (darikê pê tevnê dihonin) dengê dilê xwe çarmedorê welatê xwe nexş nekim ez terka cihêwar xwe nakîm…"

## Kul bû

*(1)*
*Te çend xwedawendên têkçûyî*
*Di serdemên gurandî de welîdand*
*Çend hezar yezdanên bê perma*
*Di xezebên bê awa de afirand*
*Çend dergûşên sêwîmayî di landika felek'ê de razand?*
*(2)*
*Çend hezar pêxember*
*Hatin fetisandin*
*Di bêrma serweriyê de*
*Çend hezar eqîd*
*Hatin xenîqandin*
*Di çavên bizdandî de*
*Çend hezar leheng*
*Hatin mehkûmkirin*
*Di wijdanên çîlvirî de.*
*Çend hezar şêrîn*
*Hatin lewitandin*
*Bi ayetên şewşewandî*
*Çend hezar Ferhad*
*Hatin xemirandin*
*Bi hedîsên vajîkirî*
*(3)*
*Kîjan yezdanê bê ar*
*Tu xapandî*
*Di neynika efsaneyan de*
*Kê tu sermest kirî*
*Di qefesa desthilatdariyê de*
*Li keviya baxê Adenê?*
*(4)*
*Di vê serdema"Şarezayî"de*
*Goştê miriyan dixwin*
*Û zindî anîne ber qaqa reş.*

KULBÎSADIQ ŞEN



## Tu nehatî

*Sal bihurîn*
*Bi hev ketin dem*
*Çiyayan li rojavayekê*
*Baskên xwe danîn*
*Bû sîh*
*Bi ser sînga deştê ve ket*
*Ez jî bi ber sira*
*Bayê xeman ketim*
*Li hêviya te*
*Li vê nizarê rûniştim*
*Tu nehatî*
*Şev bi mijangên xwe*
*Bi tariyan ve hilawest*
*Li qentara çiyan*
*Li ber sorgulan*
*Min pişta xwe da*
*Palpişta xeman*
*Bêriya te xwe li min pêça*
*Li ber ji hal ketim*
*Tu nehatî*
*Hêstir li ber bîbikên min*
*Di çola rûyê min de ziwa bûn*
*Dema bihara mizgîna te dayî*
*Ez bêhîş kirim*
*Kulîlk bi halê min giriyan*
*Lê tu nehatî*
*Dengê lorîna bilûra şivanekî*
*Di ser çemê kedera min re davêt*
*Nizanim awazê kîjan kilamê bû*
*Ku ji nava çîroka emrê min dihat*
*Ew emrê bes li hêviya te mayî*
*Bang dikir digot*
*Tu nehatî*
*Tu nehatî*

Girtîgeha Tipa H a DÎLOKÊ
M.CAN DÎNLER

## Qerf Henek

### Em hefteyek dibistanên we boykot dikin




### QWX dixwaze bi ABC'yê re biçe dibistanê lê nahêlin




www.arsivakurd.org



# Xelatên Şehîdên Çapemeniyê û Mûsa Anter diyar bûn

**Encamên Xelatên Şehîdên Çapemeniyê û Mûsa Anter diyar bûn. Di beşa tirkî de nûçegihana DÎHA'yê ya Wanê Nazan Sala bi nûçeya "Bûkên firotinê", di beşa nûçeyên kurdî de jî nûçegihanê ANF'ê Serdar Eroglu bi nûçeya 'Kevirê bi nalet yê Kêlaşînê!', di beşa wêneyan de Paşa Îmrek, di beşa karîkaturan de jî Raîf Zor xelat wergirtin**

STENBOL - Di 19'ê îlonê de bi merasîmekê dê li Amedê xelat bên dayîn. Xelatên Şehîdên Çapemeniyê û Mûsa Anter qezenckirin diyar bûn. Di juriyê nûçeyên kurdî de, Mazhar Gunbat, Mesûd Hamîd, Leyla Ayaz, M. Alî Ertaş, Tayîp Temel; di juriya nûçeyên tirkî de jî Ertugrul Kurkçu, Fatîh Polat, Berat Gunçikan, Ahmet Tulgar, Huseyîn Aykol; Di Juriya Ramazan Ozturk, Gultekîn Tetîk, Îsa Çelîk, Çerkes Karadag, Hacer Persîdat û di juriya karîkatur de jî Tan Oral, Gulay Batur, Ender Ozkahraman, Sarkîs Paçaci, Halîl Încesu jî di nav de bû, di beşa herî serlêdan û juriyan di hilbijartinê de zahmetî kişand beşa karîkatur bû.

*Nûçeya kurdî: 'Kevirê bi nalet yê Kêlaşînê!'*

Bi nûçeya 'Kevirê bi nalet yê Kêlaşînê!' nûçegihanê Ajansa Nûçeyan a Firatê (ANF) Serdar Eroglu layîqî xelatê hate dîtin. Di nûçeya kurdî ya di 8'ê îlona 2010'an de di ANF'ê de hat weşandin û di rojnameyên kurdî de hat weşandin de, kevirekî ku li hêrama Kêlaşînê ya di navbera Herêma Kurdistana Federal û sînorê Îranê de hatiye kişfkirin tê vegotin.

Eroglu, di nûçeyê de ev tişt gotibûn: "Sira kevirê bi sedsalan e li Kêlaşînê ye û bejna wî 2 metre ye nedihat zanîn. Kevirê wekî kevirê Kêlaşînê tê zanîn di sala 1828'an de hat kişfkirin. Piştî hat kişfkirin jî, heta sedan salan sira xwe parast. Piştî di 1961'an de sira wî hat dîtin, rastiyek derket holê. Nivîs bi lanet bû...".

Xelata Taybet a Juriya Nûçeyên Kurdî jî, nûçegihanê rojnameya Rûdawê Zekî Ozmen bi nûçeya bi sernavê "Bi hezaran bûk û zavayên kurd fêrî almanî dibin" da ku li Herêma Kurdistana Federal û Ewropayê weşanê, wergirt.

*Di nûçeyên tirkî de: Satilik gelînler (bûkên firotinê)*

Di beşa nûçeyên tirkî de jî nûçegihana ajansa DÎHA'yê ya Wanê Nazan Sala bi nûçeya xwe ya bi sernavê "Satilik gelînler (bûkên firotinê)" bû yekem, layîqî xelatê hat dîtin. Nazan Sala di nûçeya ku di 30'yê hezîrana 2010'an de DÎHA'yê weşand de û di hind rojnameyên rojane de hat weşandin de, diyar kiribû ku "Li herêmê keçên temenê wan di navbera 13 û 17'yan de diguherin, bi zilamên astengdar, yextiyar û bî yên ji Anatolyaya Navîn û li gelek deverên Tirkiyeyê tên, di beramberiya perayan de tên firotin." Di beşa nûçeyên tirkî de jî, ji ber nûçeya der barê Ceylan Onkol a 12 salî ya bi sernavê, "Kizimin parçalarini etegîmde taşidim, (Min perçeyekên keça xwe di etekê xwe de veguhest) û ji ber nûçeyên derbarê Ceylan Onkol de Xelata Taybet a Juriyê ji bo Faruk Balikçi hat dayîn.

*Wêne û karîkatur*

Di beşa wêne de jî bi wêneyên bi sernavên "Banyo ve çadirda yaşam (banyo û jiyana di konan de" Paşa Îmrek qezenc kir. Di beşa karîkatur de jî Raîf Zor bû yekem. Endamên Juriyê ku herî zêde di hilbijartina yekemîn a karîkaturan de zahmetî kişandin romana kartonî ya "Dînmedî Halk Tufani (Tufana gel ranewestiya) û "Sîslî Roman" a Raîf Zor ên hatin weşandin jî hene. Jûriyên karîkaturan, karîkaturên Aşkin Ayrancioglu, Mehmet Bogatekîn, Mehmet Aslan, Ahmet Avci, Senar Dolaz, Huseyîn Aslan, Bîlal Onen, Murat Îpek û Bariş Înan layîqî pêsindayînê dît. Û nûçeyê Taybet ê Jûriyê jî da Mahmut Ulusan.

*Xelata Gurbetellî Ersoz dan Gurbet Çakar*

Xelata Gurbetellî Ersoz jî, dan Midûrê Karên Nivîsan û Xwediyê Îmtiyaza Kovara Hêviya Jinê ku li Tirkiyeyê yekem kovara bi kurdî tirkî weşanê di ye Gurbet Çakar ku ev 6 meh in girtî ye û bi 13 sal ceza tê darizandin.

Xelatên Rûmetê ya Çapemeniya Azad jî, layîqî Midûrê Karên Nivîsê û Xwediyê Îmtiyaza Rojnameya Azadiya Welat ê berê Ozan Kilinç ku bi 21 sal û 3 mehan tê darizandin hat dîtin.

Xelata Kedê ya Çapemeniya Azad jî, Mehmet Atalay (Sofî) ku salên demdirêj li Sêrtê belavkariya rojnameyê kir û timî rastî pêkutiyan hat wergit.

*Xelat di 19'ê îlonê tên dayîn*

Xelat di 19'ê îlonê de roja yekşemê dê bi merasîmekê li Amedê bên dayîn. Bîranînên têkildarî zanayê kurd Mûsa Anter jî 20'ê îlonê li Amed û Nisêbînê dê bên çêkirin.

Xelatên Rojnamegeriya Şehîdên Çapemeniyê û Mûsa Anter, ku wekî kevneşopiyekî ji sala 1993 û vir ve tên dayîn ji aliyê şopdarên Apê Mûsa ve tê organîzekirin; di sala 1993'yan de "Ozgur Gundem", 1994'an de "Ozgur Ulke", 1995'an de "Yenî Polîtîka", 1996'an de "Demokrasî", di sala 1997'an û 1998'an de "Ulkede Gundem", di sala 1999'an de "Ozgur Bakiş", di sala 2000'an de "2000'de Yenî Gundem", di salên 2001 û 2002'yan de jî "Yedîncî Gundem", di 2003'yan de "Yenîden Ozgur Gundem" dabûn. Di salên 2004, 2005 û 2006'an de "Ulkede Ozgur Gundem", di 2007'an de "Gundem", di 2008'an de "Alternatîf" û "Azadiya Welat", di 2009'an de jî rojnameyên "Gunluk" û "Azadiya Welat" dabûn.



Wêneyê Paşa Îmrek hêjayî xelata yekemîn hate dîtin.



Karîkaturê Raîf Zor hêjayî xelata yekemîn hate dîtin.



# Ji bo bîranîna Dînk pêşengeha 'Ayrikotu'

STENBOL - Girenendeyê giştî yê rojnemeya Agosê Hrant Dinkê ku di 19'ê Çileya 2007'an de hate qetilkirin ji bo bîranîna Dînk di roja jidayikbûyina wî de pêşengeha karîkaturan a bi navê 'Ayrikotu'yê vebû.

Girenendeyê giştî yê rojnemeya Agosê Hrant Dinkê ku di 19'ê Çileya 2007'an de hate qetilkirin ji bo bîranîna Dînk ku 15'ê Îlonê roja jidayikbûyina wî ye li Restorana Cezayîrê ya Beyoglu pêşengeha karîkaturan a bi navê 'Ayrikotu'yê vebû. Ji ber ku 15'ê Îlonê roja jiyadayikbûyina Dînk e bi taybetî vê rojê hate pêjirandin. 60 karîkaturên ku ji aliyê karîkaturîstên Ohannes Şaşkal û Umît Kartoglu çêkirine dê pêşkeşî hunerhezan bikin.

Karîkaturîst Kartoglu diyar kir ku, Dînk li vê axê kesekî ji giyayekî din bû, ji ber wî jî me vê pêşengehê diyarê wî kir.' Ew aîdê vê axê bû. Niha jî di nava axa ku ji hezdikir de ye. Biryara ku DMME'yê da jî xelata duyemîn bû ku roja jidayikbûyina wî hatibû dayîn.' Pêşengeha ji bo biranîna Dink heta 24'ê îlonê li Restorana Cezayîrê vekiriye.

# Li Amedê pêşengeha 'Darbe'yê

AMED- Pêşengeha bi navê 'Darbe'ku par li Galeria huner Outlet Tophane hatibû vekirin.Îsal ji vê pêşengehê anîn Amedê.Darbe ku berdewame û ku rojeke piştî 12'ê Îlonê vebû. Bi navê '13'ê Îlon'ê li Navenda Huner aAmedê(DSM) vebû.

Pêşengeha 'Darbe'yê li Navenda Huner a Amedê (DSM)ê bi beşdariya şaredarê Amedê Prz.Osman Baydemîr, Cigira serokê ÎHD'ê Prz.Reyhan Yalçindag, Karsaz Osman Kavala, Kurator Azra Tuzunoglu, Nivîskar Şener Ozmen û gelek hunerhez beşdar bûn. Şaredar Baydemîr li pêşengehê geriya û Halil Altindere, Canan, Asli Çavuşoglu, Koken Ergun, Bengu Karaduman, Şener Ozmen, Ozlem Sulak û Koma Bellek Kolektîfa MSGU pîroz kir.

Pêşengeha 'Darbe'yê heta 13'ê Cotmehê li Navenda Huner a Amedê (DSM)ê vekiriye.



www.arsivakurd.org

ROJEVA WELAT
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü:
Sevim KAPLAN
Yönetim Yerî:
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah.
Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.



# ‘Ewlehiya jiyana me nemaye’

Botan GULAN / BEHDÎNAN - ANF

Ji ber bombebarana balafirên Artêşa Tirk û topbarana Îranê yên herî zêde zirarê dibînin û ewlekariya jiyana wan tune ye gundiyên li zozanên Herêmên Parastinê yên Medyayê dijînin. Bi taybetî îsal di mehên borî de gelek caran hem bi bombebaranê ve hem jî bi topbaranê ve rû bi rû man. Ji lewre gundiyên li zozanan kon vekirine û ji bo debara jiyana xwe sewalan xwedî dikin û bexçeyan diçînin, diyar kirin ku îsal pir zêde ji bombebaranan bibandor bûne û bombebaran hem li ser jiyana wan û hem jî li ser aboriya wan bandoreke pir neyînî kiriye. Her wiha gundiya diyar kir ku temînata ewlehiya jiyana wan yekitiya kurdan e.

Ji gundiyan Taha Ezîzê ku ji temenê xwe yê zaroktî tê zozanan û sewalan xwedî dike diyar kir ku bi taybet îsal di mehên 5-6 û 7’an de bombebarana balafirên tirk û topên hewayî zêdetir bû û ji ber wê gelek malbatên ku bi tenê debara jiyana wan û çavkaniya aboriya wan li zozanan xwedîkirina sewalan e, koçî bajaran kirin. Taha Ezîz wiha pêde çû; “ji ber bombebarana balafiran û topbaranê îsal gelek malbatên ku hatibûn zozanan koçber bûn. Her sal bi qasî 500 malbat têne van zozanan. Lê îsal piştî topbaran û bombebaranan gel neçar man koçberî bajaran bibin. Bi taybet di êrişa hewayî ya li Xakurkê pêk hat de kuştina gundiyan li ser gel bandorek mezin çêkir û di 10’ê Tîrmehê de êrîşa hewayî li dijî vê qadê jî pêk hat bû xala dawî ya hêrsa gel û piştî wê gel neçar ma ji zozanan bireve. Ji lewre bi sedan malbat tevî ku xizan û feqîr bûn û debara jiyana wan bi tenê li van zozanan xwedî kirina lawir û pez û çandina bexçeyane jî dest ji zozanan berdan û çûn bajaran. Her wiha ev malbatana ji ber ku derveyî vê tu çavkaniyên wan ê debarê tune ye, îsal zirarek mezin kirin.”

**Li ser derûniyê bandor dike**

Taha Ezîz anî ziman ku bombebarana li nêzîkî zoman pêktê û dengên balafirên dewleta tirk li ser wan û bi taybet zarokan bandorên neyînî yên derûnî dike û axaftina xwe wiha domand; “Her wiha bombebaran li hawîrdorên zoman têne kirin û dengên balafiran li ser gelek gundiyên ku koçber bûn û li ser zarokên me jî bandorên neyînî dike. Dema balafir tên û bombebaranê dikin an topbaran çêdibin, hemû kes ditirse û dikevin kozikên ku hatine çêkirin. Êdî dêrûniya zarokên me xerab bûye. Zarokên me êdî newêrin derkevin devre.”

> Gundiyên li zozanên Herêmên Parastinê yên Medyayê dijîn, her tim bi bombebarana balafirên dewleta tirk û topbarana Îranê ve rû bi rû dimînin û ji ber vê hem ji ber lêdanê mirovên li zoman dijîn jiyana xwe ji dest didin û hem jî di aliyê aborî de gelek ziraran dibînin

**Ewlehiya me nemaye**

Ezîz destnîşan kir ku li çiya û zozanên Kurdistanê ku xakên bav û kalên wan e, ewlekariya jiyana wan nemaye û nerazîbûna xwe wiha diyar kir; “Êdî em nikarin werin ser xakên xwe, zozan û çiyayên xwe. Ma em êdî nikarin li xakên bav û kalên xwe jî bi ewle bijîn?”

Taha Ezîz diyar kir ku ew dewletên Tirkiye û Îranê bi tundî şermezar dikin û wiha pêde çû; “Em dewletên xwe wekî Îslam bi nav dikin û gel bombebaran dikin, Tirkiye û Îranê şermezar dikin. Ev her du dewlet ne Îslam in, yên Îslam her roj qadên medenî bombebaran nakin, mirovan sivîl nakujin û zirar û ziyanên mezin nadin gundiyên zoman ê xizan. Ji lewre em dizanin ev dewlet ne misilman in.”

**‘Divê hikûmet bê deng nemîne’**

Ezîz balkişand ser bêdengiya hikûmeta herêma Kurdistanê ya li hember bombebarana Tirkiye û Îranê û wiha bilev kir; “Em bêdengiya Hikûmeta herêmî ya Kurdistanê û partî û rêxirawên medenî yên başûrê Kurdistanê şermezar dikin. Divê yê herî zêde xwedî li me derkeve hikûmeta me ya başûrê Kurdistanê ye, lê hikûmet berovajî vê tevgeriya û bi gotinekê be jî van bombebarana şermezar nekir û helwesta xwe diyar nekir. Em bang li Hikûmeta Heremî ya Kurdistanê û hemû partiyên siyasî dikin ji bo rawestandina van bombebaranan bila bibin xwedî helwest û li hember dewleta tirk û Îranê rawestin.”

**‘Aramî li warê me nemaye’**

Ji jinên li zoman Meryem Ehmed a ku ji ber bombebarana dewleta tirk 3 caran rêviyaye û konê xwe barî cihekî din kiriye serpêhatiya xwe ya îsal wiha vedibêje; “Me destpêka biharê zomên xwe anîn Xakurkê. Dema balafirên Tirkiye Xakurkê bombebaran kirin û li zom û konên gundiyan dan, me ji vir bar kir. Me konê xwe ji Xakurkê anî Kelaşînê û ji wir jî ji ber bombebarana balafirên Tirkiye û topbarana Îranê koçî vir kir.

Tu aramî û hizûra me ji ber van bombebaranê nemaye. Ji ber xizaniyê em hatine van çiyayan û em li zoman dijîn. Ji derveyî xwedîkirina lawiran û çandina bexçeyan tu çavkaniyên me yên debarê tune ye. Lê ji ber van rewşan em nikarin li vir debara jiyana xwe û zarokên xwe bikin. Dema balafirên tirkan li zomên Xakurkê dan keçeke xizmê me jiyana xwe ji dest da. Ji lewre gelek zom neçar man, biçin bajarên xwe.”

Meryem Ehmed destnîşan kir ku derveyî van çiyayan cihekî ew pêde biçinê tune ye û wiha pêde çû; “Em dewleta tirk û Îranê şermezar dikin. Li derveyî van çiyayan cihekî em biçinê tune ye. Tu xêra wan ji bo me tune ye, bila şerê wan jî nebe. Em di vê mijarê de bêdengiya hikûmeta herêmê jî şermezar dikin. Divê hikûmeta herêmê gundiyên zoman biparêzin.”

**‘Temînata ewlehiya kurdan yekitî ye’**

Ji gundiyan Cemîl Îsmaîl jî anî ziman ku ji ber bombebarana balafiran û topbaranê rewşa gundiyên zoman pir xerab bûye û ewlehiya jiyana wan tune ye û axaftina xwe wiha domand; “Em êdî nema dikarin li zozanan bijîn. Destpêka biharê biqasî 500 malbatên ji Başur, hatibûn zozanan û konên xwe vedabûn. Lê piştî bombebaran û topbarana zêde ya dewletên Tirk û Îranê niha 30-40 zom nemane. Hemû gundî ji ber xeteriya jiyanê ditirsin û zozanan terk dikin.

Em ji bo rêvebirin û debara jiyana xwe hatina van zozanan, ji lewre em dixwazin bi awayek ewle li van zozanên Kurdistanê bijîn.” Cemîl Îsmaîl destnîşan kir ku ji bo pêkanîna ewlehiya jiyana wan divê yekîtiya Kurdan pêk were û wiha anî ziman; “Ji bo ewlehiya jiyana hemû kurdan divê hemû kurdên li her çar parçeyê Kurdistanê dijîn dest bidin hevdû û yekîtiya xwe ava bikin. Bi yekitiyê encax em dikarin bigihêjin aştî û çareseriyek birûmet û hemû kurdan di nava ewlehiyê de bijîn.”

**‘Qetilkirin li dijî ola Îslamê ye’**

Ji gundiyan Şerîf Ehmed balkişand ser qetilkirina 9 gerîlayên ku li Colemêrgê jiyana xwe ji dest dane û diyar kir ku ev pêkanîn derveyî mirovahiyê û Îslamê ye û wiha pêde çû; “Tevî ku KCK di vê mehê de biryara bêçalaktiyê îlan kir û li her qadê li gorî vê biryarê tevdigere jî em dibînin ku dewleta tirk operasyonên xwe yên tunekirinê didomînin û di van operasyonan de gerîlayên kurd jiyana xwe ji dest didin. Di nava meha Remezanê û bi taybet di cejnê de li darxistina operasyonan û qetîlkirina gerîlayan li derveyî îslamê ye. Li Colemêrgê ji aliyê Artêşa Tirk ve qetîlkirina 9 gerîlayan cejna Remezanê li gelê kurd heram kir. Êdî Cejna Remezanê ji bo gelê kurd bûye cejna reş. Em dewleta tirk şermezar dikin. Ev bûyer jî nîşan da ku dewleta tirk ne misilman e, bêdîn û îman e.”


Meryem Ehmed


Taha Ezîz


Cemîl Îsmaîl


Şerîf Ehmed

## Zanîngeha Nalanda ji nû ve tê înşakirin

YENÎ DELHÎ- Li rojhilatê Hîndîstanê li eyaleta Biharê, hate hînbûn ku Zanîngeha Nalanda ya navdar ku 800 sal berê herifîbû, ji nû ve tê înşakirin.

Bi sedan sal in ronakbîrên hîndû hêvî dikirin ku ev Kampusa Nalanda bibe sembola Modern a Hîndîstanê. Hikûmeta Hîndîstanê ev biryar erê kir.

Zanîngeha Nalanda, bi giştî 10 hezar xwendekarên wê yên ku ji welatên Asyayê bû, hebûn. Li gorî dîrokzanan ev zanîngeh, zanîngeha herî baş a bû di warê fen, felsefe, matematîk û wêjeyê de perwerdehiya herî baş dida.

Zanîngeha Nalanda li hemû cîhanê deng daye. Di sala 1193’yan de li Îngilistanê dema ku Zanîngeha Oxfordê derket holê, Zanîngeha Nalanda ji aliyê dagirkeran ve hatibû talakirin û pirtûkxaneya wê hatibû şewitandin.

Zanîngeha ku 90 kîlometreyî ji Patnayê dûr e, niha tenê hin bermayînên wê mane. Stûn û dîwarên wê yên ku bi tuleyên sor hatine çêkirin li ser piya maye.

Profesorê felsefe û aboriyê yê hîndû Amartya Kumar Sen yê ku xelata aborî ya sala 1998’an girtiye, diyar kir ku ev zanîngeh di dîroka mirovahiyê de navenda herî girîng a hişmedî û lêkolînê bû.

Amartya Kumar Sen ku di projeya înşakirina Nalandayê de cih digire diyar kir ku ew bi biryarin ku dê ji nû ve Nalandayê înşa bikin.

Li gorî Kumar Sen di Nalandayê de 2 hezar hîndekarî, li gorî kevneşopiya budîst bi gelek zimanî ders dida. Parlamentoya Hîndîstanê niha ji bo ku Nalandayê ji nû ve înşa bike ligel bermayînên zanîngehê 200 hektar erd tahsîs kirine. Sen da zanîn ku projeya malîyeta wê gelek gelek zêdeye.



## Bûyereke mucîzewî

COLORADO- Li DYA’yê zarokekî du salî yê bi navê Geoge Otteson, di hewayeke gelek cemidî de ket nava çem û dilê wî sekinî. Lê tiştekî mucîze çêbû û piştî 60 deqeyî dilê zarok wekî normal xebitî.

Bûyera mucîze li cihê herî cemidî yê DYA’yê Colorado Gunnîsonê pêk hat. Zarokê du salî dema ku bi malbata xwe re çûbû tatîlê winda bû. Malbata wî ew di binê avê de dîtin. Malbatê diyar kir ku dema ew dîtin de 25 deqe qediya bû. Malbata wî mudaxaleyên ewil kirin û piştre rakirin nexweşxaneyê. Doktora li wir diyar kirin ku întîmala vegere jiyana wî ji sedî 1’e. Lê zarok bi awayekî mucîze dilê wî xebitî û her wiha tu pirsgirêkeke wî ya tenduristiyê tune ye.



www.arsivakurd.org